welat

Sal:2 Hejmar:101 23–29 Rêbendan 1994 10.000TL (KDVD) Rojnameya Hefteyî

*Dr. Cemşîd Heyderî: 'Çand li ber lehiya serhildanê çû'*



Rûpel 16

Di hilbijartina dawî de hilbijêrên neqeydkirî pirr ray bi HEP'ê dan windakirin. Ji bo ku DEP jî nekeve rewşa HEP'ê bi girîngî li ser vê meseleyê disekine. Bes di dawiya lêpirsîna me de ev encam derket:

# Zehfê hilbijêrên DEP'ê neqeydkirî ne!

● *Polîtîkaya dewletê ya koçberkirinê tesîra xwe li kesên wek hilbijêrên DEP'ê dike û dibe sebebê windabûna rayên wê ● Li bajarên ku koç têne, hejmareke mezin a hilbijêrên bêqeyd lê çêdibe ● Lêpirsîn û legerîna me derxiste rastê ku li Stenbol, Îzmir, Edene, Mêrsîn, Amed û Batmanê gelek kesên neqeydkirî hene ● Li Amedê ku DEP lê bêgengeşî xurt e, 30 hezar kesên ku wek hilbijêrên wê tên qebûlkirin, navê wan di lîsteya hilbijêran de nehatiye nivisîn ● Li gorî lêgerîna me û daxuyaniyên DEP'vanan diyar bû ku gelek Kurd bi zanebûn ji aliyê memûrên qeydkirina hilbijêran ve nehatine nivisîn.*

Rûpel 8



*Di şevên şahî û mihrîcanên DEP'ê de beşdar bêqedar in, lê rastiyek diyar bû ku pirrê wan ji mafê ray avêtinê bêpar in, ji ber ku kitm in.*



### HELBESTVANIYA CELADET BEDIRXAN

Berf dihele li zozan
Stirî şîn in li deştan
Kulîlk hêj nuh şepal in
Gul û bilbil heval in
Buhar e nuh buhar e
Tebîet giş li kar e.

Rûpel 10



### HUNER LI WELATEKÎ SERBIXWE DIGIHÎJE PÎVANÊN CÎHANÎ

Huner, berhema bikaranîna xeyalê ye, vekirina çav e. Honandin û rêsandina bûyer, serpêhatiyan e. Şêweyên hunerî gelek in û rengo rengo ne: Helbest, roman, sînema, nivîsandin, wêje, tinazo, stran...

Rûpel 11

# Kak Kendal ji Sabahê re çi gotiye?

Rojnameya delal Welat, di gel silavên birayetî, serketina we ji Yedzanê mezin dixwazim.

Di hejmara 94'an a Welat, rûpela 7'an de gotarek hatibû nivîsandin bi navê "Kendalê nezan ji halê Kurdan çi zane?" ku di vê gotarê de pirr bêinsafane der heqê Kak Kendal de hatibû dawerîkirin.

Gelî dostan! Rexne yek ji kar û barên pirr hêja yê edebî û çandî ye û ji bo pêşveçûna tore û ferhenga her gel û neteweyekê pirr lazim û pêwist e. Lê ne bi rexneyên bi vî şeklî û forma ku nivîskar Kak M. Rojava nivîsandiye, bi ya min ev cure rexnekirin der heqê zana û keseyatiya Kurd de pirr xeternak e. Dibe ho (sebeb) û delîlên dijminkarî û ev cure pîvan û nivisandin ne tenê xizmet ji bo gel û neteweyan belku pirr pirr zirarê dide yekbûn û hevdiliya me. Û dijmin jî bi ev cure nivîştan dilşa dibe.

Gelo yek ji mafên serdestê her însan û mirov, ne heqê azadî û demokrasiyê ye? Li nav her gel û neteweyeyê ku azadî û demokrasî tune be, ew gel û netewe hergiz (herim) nikare bi pêş ve biçe.

Ez nizanim ku Kak Kendal di hevpeyvîna xwe de di gel nuçevanê Sabahê çi gotiye.

Lê nikarim ku guman bikim ku Kendal li dijî gelê Kurd axivî be. Hûn jî nabe ku kar bikin ku Tirk û kemalîst ji wê dilşa û kêfxweş bin û nabe ku bi vî rengî keseyetî û zanayên xwe binirxînin.

Eger hevpeyvîna Kendal bi dilê we nebûbe, divê hûn bi rûmet û mentîq bersiva wî bidin. Ev gotar bi rastî ji min re pirr ne xweş bû. Hêvîdar im ku hûn dadgeri û daveriye pirr baştir der heqê kesayetiya xwe de bikin û nivîştarên xwe pirr baştir binivîsin

***Ehmed Şerîfî/ Mehabad***

# Tu çima serê xwe dikî belayê

Bingeha hemû ronahiyan xwendin e. Du çeqên xwendinê jî hene.

1.Ên ku dixwînin û dimînin di teoriyê de, ew rexnedar in.

2. Ên ku dixwînin û teoriyê dimeşînin li ser pratîkê û rêve dibin ew rexneker in.

Mîsala rexnedaran: Ez piçek xwezayî dibînim, çimkî bandora 355 salan yanê bi peymana 1639. a vir de tirs, zilm û birçî hiştin yek seat li ser me nehatiye rawestandin. Û hemû derî û dora me hatiye girtin. Em di tariyê de mane. Dewleta dagirkeran yek derî ji me re vekirî nehiştiye. "Deriyê bi jiyana klasîk" Mînak: Bixwîne, bibe karmendê dewletê, û xwe têkîlî tu ramyariyan (siyasî) neke. Tu dê nanekî bi rehet bixwî û bêminet. Bi kurtahî "bi hîmet bibe, daku tu jî dirêj bî." Mejiyê me hatiye şûştin. Gotinek heye dibêjin: "Tu çibikî karê (ambar-depo) ew têt xwarê."

Dema ku ez rojnameya Welat dikxwînim an jî pirtûkekê, peşîn mirovên min ên xwendevan û karmendên dewletê dibêjin: Lawo tu çima serê xwe dikî belayê? Welle tuyê rojekê jovan (poşman) bibî û tu bi nanê zarokên xwe dileyizî.."

A Rexnekeran: dibêjin.

Tirs û rev- ê tev ji bîr bikin

Ferz e tifaqê çêbikin

Ger darcu (çek) wan peyda bikin

Ji Qewmê me re taet ev e..

***Rêber Işik Karmendekî Dewletê/ Şirnex***

## Ji bo bîranîna Reiner DAUNER

(15.07.1963- 05.09. 1993)

**ŞEHÎD NAMIRIN**

Ya baştirîn ew e ku
em hedefên ku wî çavên xwe kutabûnê bidomînin,
tiştên li pey xwe hiştin em bigirin û bidin kesên din. A baştirîn
ew e ku em têbikoşin ji bo tiştên li ba wî û li ba me hêja.
Em spasdar in ji wan kesan re ku
di saetên herî dijwar ên jihevqetînê de alîkarî,
piştgirî û helwestên miroviyê
nîşanî me dan.

***Malbata DAUNER***
***Gini PAHLING***

# Nivîsara Welat

## Jibîrnekirina Kurdî ne bes e!

Em çima ewçend li ser zimên disekinin? Gelo tirsa me heye ku zimanê me winda bibe, an jî îhtimal heye ku Kurd giş zimanê xwe ji bîr bikin? Bêguman piştî vê saetê êdî ne mimkûn e ku Kurdî winda bibe û tu hêz nema dikare Kurdî bi Kurdan bide jibîrkirin.

Ji holê rakirina zimanê Kurdî yek ji hêviyên dagirkerên Kurdistanê bû, bes ev hêviya wan kete nav sergoyê dîrokê. Ev gelê ku di pêvajoya sedan salan de, tevî her cure polîtîkayên asîmilasyonê, zimanê xwe bi temamî ji bîr nekir, îro êdî qet û qet ji bîr nake.

Bes, jibîrnekirin têrî me nake. Me pêdivî bi pêşvebirina zimên, bi vî zimanê xurtkirina çand, wêje, huner û rojnamegeriya Kurdî heye.

Mixabin di vî warî de em li paş hemû gelan in. Ji ber vê yekê kar û barê me pirr e.

Divê em lez bikin. Gelên din li ser hîvê rawestgeh (îstasyon) ava kirine, lêkolînên zanistî li asîmanan didomînin û berê xwe rojê. Ji ber vî awayî, karê me pirr e. Na, ziman jibîrnekirin ne bes e. Em di berbanga sedsala 21.de ne. Hîna pirtûkên ku bi zimanê me hatine nivisandin bi taybetî jî li bakurê Kurdistanê dikarin bi tiliyan bên hejmartin. Em hê jî bi çend helbestvanên xwe yên berê, yên wek E. Xanî, Meleyê Cizîrî, Feqiyê Teyran pişika xwe mezin dikin û pesnê xwe didin.

***Çend nivîskarên Kurd ên hemdem, çend romanên bi Kurdî û çend hozanên me yên ku bi peyvan dikarin bilîzin hene? Wekî din, heta îro me çend pirtûkên biyanî bi wergera Kurdî xwendine. Têkoşîneke çekdar û bêhempa li Kurdistanê û li hemû cihên ku Kurd lê dijîn, bilind dibe. Beranberî vê raperîna çekdariya bi rêxistin wêjeyeke layiqî vê têkoşînê çima nayê afirandin?***

Lê me çi kiriye?

Çend nivîskarên Kurd ên hemdem, çend romanên bi Kurdî û çend hozanên me yên ku bi peyvan dikarin bilîzin hene? Wekî din, heta îro me çend pirtûkên biyanî bi wergera Kurdî xwendine. Têkoşîneke çekdar û bêhempa li Kurdistanê û li hemû cihên ku Kurd lê dijîn, bilind dibe. Beranberî vê raperîna çekdariya bi rêxistin, wêjeyeke layiqî vê têkoşînê çima nayê afirandin?

Ger ev têkoşîn, ji her aliyî ve bi hibra pênûsan derbasî ser rûpelên pirtûkan nebe, rewşenbîrên Kurd li hember dîrokê we sertewandî nemînin?

### KURD Û HELBEST

Dibêjin ji her çar Kurdan pênc heb jê helbestvan in. Helbet di vê hevokê de hinek mubalexe heye lê dîsa jî rastiyekê îfade dike. Xwendevanên me jî vê rastiyê teyîd dikin. Hema bibêje ji çar nameyan sê heb jê helbest in. Di nameya çaremîn de jî nivîseke pexşan heye lê li tenişt jî dîsa helbestek heye.

Bi kurtî Kurd giş helbestvan in. Lê mixabin ev helbestvan ne ya rasteqîn e. Her çiqas di nav van kesan de yên xwedî helbestên xurt hene jî, zehfên Kurdan ji ber tiralî û tembeliyê helbestan dinivîsin. Ji bo wan nivisîna herî hêsan helbest e. Sê sloganan biavêje, çi were bîra te binivîse, an behsa evîna xwe an jî ya welatê xwe bike ev e bû helbest.

Em li vir naxwazin vê meseleyê zêde vekin, lê pêwist e ku xwendevanên me bizanin ku helbest ne karekî welê hêsan e, kedeke xurt ji helbestê re divê.

Me dixwest ku xwendevanên me ji xeynî helbestan nivîsên din û dîtinên xwe jî li ser Welat binivîsin.

### ABONETÎ

Ji ber ku şirketa belavkirinê êdî Welat belav nake, em nikarin bi destan Welat bigihînin hemû deveran. Ji bo vê jî, xwendevanên me yên ku ji deverên navendî dûr in, ya baş ew e ku bibin abone. Hefteyiya çûyî ji ber vê rewşa awarte me dest bi kampanyaya abonetiyê kir û gelek kesan jî bi telefonê abonetiya xwe ji me re diyar kirin.

Kampanyaya me didome. Dîsa li van telefonan hûn dikarin bigerin: 528 61 16 – 511 50 07

**MAZHAR GÜNBAT**

## ..........NÛÇEYÊN CENGÊ..........

# Lê heta ku?

**Navenda Nûçeyan- 12 Rêbendan 1994-** Gerîlayên ARGK'ê êrîşêk birin ser Qerqola Pîrinçeken(Çukurca), 9 leşker û 3 gerîla mirin, 5 leşker û 2 cerdevan jî birîndar bûn.

■ Di demsala zivistanê de jî şer -bêrawestandin- didome. Germa hilbijartinê bêhna hêzên dewletê diçikîne. Ji ber ku ew ditirsin hilbijartin wê bibe referandûmekê. Ji bo vê yekê jî dewlet, li hember endam û alîgirên DEP'ê, operasyonan pêk tîne. Ji niha ve gelek gund, ji bo hilbijartinê di bin tehdîda hêzên dewletê de ne û Li gelek bajaran bi dehan kes di bin çav de ne.

■ Wisa dixuye ku wê zivistan, bi germî derbas bibe. Hêzên leşkerî, bêqeyd û bend û bi destûra ku ji dewletên biyanî standine, li hember gelê Kurd, li ser navê bi "terorîzm"ê re têkoşîn gelek (metodên) azîneyên ecêp, bikar tînin. lê heta ku?

Di navbera hêzên leşkerî û yên ARGK'ê de li Çepeqçûrê (Bîngol) li hevêrka Suveren şer derket, serbazek (bînbaşî Mahmûd Şahîn) hate kuştin.

Gerîleyan, riya Bilîs û Xana Hewêl (Baykan) girtin, bi girtinê re di nav hêzên gerîla û yên leşkerî de şer derket, 13 leşker birîndar bûn.

Li gundê Elkê (Beytüşebab) Çemanê gerîlayan bi cerdevan û leşkeran re ketin şer, 6 leşker û 2 cerdevan birîndar bûn.

Di navbera gerîla û yên leşkerî de li Curnêreş (Hîlwanê) şer derket, 2 gerîla mirin.

cendekê muxtarê gundê Horasan ku li ser Kizilkaleyê Bînalî Peker, hate dîtin. Bînalî Peker, di 20'ê Befrenbarê de ji aliyê kesên nenas ve hatibû revandin.

**13 Rêbendan 1994-** Gerîlayên ARGK'ê, girtin ser Şemrexê (Mazidax). Piştî agirbarandina li şer dezgehên dewletê, gerîla ji derdora bajêr vekişiyan û ambûlansek dewletê li ser riya Amed û Mêrdînê şewitand.

Li gundê Navşan (Şemdînlî) Üzümkiran, di navbera gerîlayên ARGK û hêzên dewletê de şer derket, 2 leşker mirin, 3 leşker jî birîndar bûn.

Di navbera gerîyayên ARGK û hêzên leşkerî de li gundê Mêrdînê Kifirtûtê şer derket, gerîlayek mir.

Cerdevanê gundê Mahsertê(Ömerlî) Anittepe Diyap Fîdan, bombe di dest de teqiya û mir

2 xwendekar Azad Önen û Serdar Kaya li Amedê ji aliyê kesên nenas ve hatin kuştin. Di bûyerê de 2 xwendekar jî birîndar bûn.

Hêzên leşkerî, gundên Tûxê (Tatwan) Çenges û Kirtvan şewitandin. Piştî şewitandinê gelek malbatan, ji gund bar kir.

Keşê gundê Hezexê (Îdilê) Mîdinê yê Suryanî Melkî Tok, hate berdan. Keşe, di 9'ê Rêbendanê de ji aliyê kesên nenas ve hatibû revandin.

**14 Rêbendan 1994-** Di navbera gerîla û leşkeran de li ser sînorê başûrê Kurdistanê şer derket, 6 leşker û 2 gerîla mirin, 13 leşker jî birîndar bûn.

Li Amedê di êrîşeke kesên nenas de xwendekarê lîseyê Azad Önen hate kuştin.

Serokê Komela Mafên Mirov (ÎHD) yê şaxa Wanê Yavuz Bînbay, di 13'ê Rêbendanê de hate binçavkirin.

Gundên Tûxê Serxaç, Wanik û gundê Mêrdînê Qurdîsê (Yardere) ji aliyê leşkeran ve hate şewitandin.

Hêzên leşkerî girtin ser gundê Hîrê, Muçtalî, Panîle (Özdemîr), Alût (Yüzbaşilar), Xoştexeber (Hoşhaber), Hüseyînkent, Yukari Alîcanlar û Bilîdane. Di sergirtinê de leşkeran gundî bi kuştinê tehdîd kirin û ji wan xwestin ku bibin cerdevan.

Cerdevanên eşîra Bûcakan girtin ser mala serokê DEP'a Serêkaniyê (Ceylanpinar) Sînan Kajûk û Cerdevanan doza dev jê berdana DEP'ê ji Kajûk kirin.

**15 Rêbendan 1994-** Li gundê Şirnexê bi navê Gundikê Mele (Balveren), ji aliyê kesên nenas ve malek hate bombekirin, 3 kes mirin, 8 kes jî birîndar bûn. Di bombek avêtinê de Abdülkerîm Karatoprak, Osman Îşcan û zarokek, ji eynî malê, mirin.

Kesên nenas li Amedê û Êlhê (Bataman) 4 kes kuştin. Li Amedê Sedat Çağatay (24) û M. Şah Taşan (15) di êrîşê de hatin kuştin.

Li Çiyayê Agirî Hevêrka Korxanê di navbera gerîla û leşkeran de şer derket, leşkerek hate kuştin, 8 leşker jî hatin birîndarkirin.

Arteşa Tirk, êrîşî başûrê Kurdistanê kir, 2 zarok mirin 4 gundî jî birîndar bûn.

Gundên ku li Tûxê ji aliyê leşkeran ve hatibûn valakirin (Çorsên, Sarxaç, Ez, Avetax, Însus û Wanik), bûne qerergehên leşkerî. Hêzên leşkerî, wan gundê valakirî, ji bo operasyoneke mezin wek qerargehan amade dike.

Gundê Mêrdînê Baskilê ji aliyê leşkeran ve hate şewitandin.

**16 Rêbendan 1994-** Li Cizîrê wasiteya leşkerî li mayina gerîla qelibî, serbazek di nav de 5 leşker mirin. Li Mêrdînê jî "albayek" li mayinê qelibî, lingên wî jê bûn.

Li Elihê di nav hêzên gerîla û yên leşkerî de şer derket, gerîlayek mir.

Li gundê Kemah bi navê Eşîmlî, 6 kes ji aliyê hêzên dewletê ve hatin binçavkirin. Li Elbîstanê jî gundiyek (Ahmet Teke) ji aliyê leşkeran ve hate girtin.

Kesên nenas li Amedê şagirt Bayram Yapici birîndar kir.

Qomûtanê Alaya Pirsûsê (Sirûç) Serel Saral, ji muxtarê 50 gundan daxwaza cerdevaniyê, bi darê zorê xwest.

2 Şivan ji aliyê leşkeran ve hatin kuştin. Ev şivan Ahmet Altürk (30) û Ahmet Altürk (39) ku li Qilaban li çiyayê Elan hatibûn kuştin, ji hêla çapemeniyê ve wek 'terorîst' hatibûn rêdan.

**17 Rêbendan 1994-** Di operasyonên dewletê yên ku li çiyayê Agirî qewimîn de şer di nav gerîla û leşkeran de derket, 4 leşker hatin kuştin, 4 leşker jî birîndar bûn. Piştî bûyerê leşkeran girtin ser gundê Zorava (Yukari Zorava), gundiyek kuştin.

Li Îdirê jî şer di nav gerîla û leşkeran de derket, li gorî agahiyên Kurd-A'yê 15 leşker hatin kuştin.

Hêzên leşkerî, bi balafiran, bi topan derdora gundên Elbîstanê (Kontarma, Kistîk, Devrîcîmlî, Hasanalîlî, Kaşenlî û Tapkiran) bombe dike. Heta vê gavê gelek gundî ji aliyê leşkeran ve hatine binçavkirin.

Leşkeran li gundê Licê Engûlê gelek mal şewitandin.

Li Culemêrgê, Qers û Îdirê gelek kes, ji aliyê hêzên emniyetê ve hatin binçavkirin.

Hêzên dewletê li Dêrsimê girtin ser mala malbata Dr. Baran, qomûtanê gerîla yê Eyaleta Dêrsimê û gelek xesar dane malê.

2 leşkeran ji bo biryara dirêjkirina tezkere, qereqola xwe (Xelkova Koçdaği) şewitand.

**18 Rêbendan 1994-** Gundê mebûsê DEP'ê Zübeyîr Aydar Derawût, di bin ablûkaya hêzên leşkerî de ye. 26 gundiyên ku hatibûn binçavkirin jî tu agahî ji wan tune. Li gund gelek mal ji aliyê leşkeran ve hatibûn şewitandin.

Li Nisêbînê gundê Sirêçkê 7 mal ji aliyê leşkeran ve hatin şewitandin.

Li Amed û Nisêbînê 3 kes ji aliyê kesên nenas ve hatin kuştin, navê yên ku hatine kuştin ev in: Ahmet Anîş (45) û Süleyman Dün li Amedê û Şemsettîn Ural (39) jî li Nisêbînê.

Pirên li ser çemê Avaspî (Nisêbîn) ji aliyê gerîlayan ve hatin bombe kirin, 2 pir, xera bûn.

Cerdevanên Eşîreta Bûcakan, girtin ser gundê Pirsûsê (Sirûç) Bûbikê û bi zorê Nûrî Şahîn ji dêla birê wî ve Türkmen Şahîn, rehîn girtin.

# HAWAR

**Dilbixwîn**

## 'Welat' di sed hejmar û sed hefteyiya xwe de

Rojname organeke ragihandinê ye. Ragihandin (komînîkasyon) parçeyekî jiyana mirovahiyê ye. Di pêşvebirina civakê de, erk û delametên wê yên piralî hene. Nemaze ji bo neteweyeke dagirkirî re, ragihandin (rojname, Kovar, TV) "berdevkiyê jê re dike û daxwaz û armancên wan tîne ziman.

Ne tenê Kurd neteweyeke bêebûkat in, weke ku rojhilatnas û Îranîst şîrove dikin, her wiha derdikeve peyde nebûye ku bi zimanê xwe yê zikmakî rojnameyeke xwerû bi kurdî biweşînin. Lewma jî, kesekî dengê Kurdan nebîhistiye, heya gihîştiye radeyekê ku werin jibîrkirin jî. Li ser bingeha vê rastiyê mirov dikare gelê Kurd weke gelekî bêziman (zar) binasîne.

Dîsa jî, di bizava rojnamegeriya Kurdî de, mirov dikare navên gelek rojname û kovarên cur be cur bibîne. Ji rojnameya Kurdî ya yekemîn **KURDÎSTAN** û heya niha, hinek hilgavtin di warê ragihandinê çêbûne, lê mixabin dewam nekirine. Lewma jî armancên xwe yên neteweyî pêk neanîne.

***Dema ku xwendin û nivîsandina bi Kurdî li Tirkiyeyê û Kurdistanê qedexe bû niha jî di navbera serbestkirin û qedexekirinê de ye, gelek kes û koman ji bo weşandina berhemên bi Kurdî pozê xwe bilind kirin. Hinekan gava yekemîn avêtin, negihandin serî, "bilind firriyan nizm ketin". Elbete, kesên li ber xwe nedin nikarin di nava merc û hoyên dijwar de rûmet û nirxên neteweyî biparêzin. Bêguman, ji bo derhanîna rojnameyeke Kurdî, xwe ragirtin berî her tiştî pêdivî ye. Divê mirov bi dûrbîna Ewrûpiyan rojnamegeriya Kurdî nenirxîne.***

Rojname ji bo pêkanîna armancên gel tê weşandin. Erka wê ya yekemîn hişyarkirina gel e. Bi vejandina kevneşopên gel ên çandî, lîteraturî, wêjeyî, folklorî, dîrokî û hwd. radibe. Ji bo parastina berjewendiya kesan, rojnameyek nikare di jiyanê de li ser piyan bisekine. Temanê rojnameya gel dirêj e, paya wê bilind e, cihê wê dîrokî ye. Bervajî vê yekê, rojnameyên kesan nikarin meşa (rêveçûna) xwe dirêj dewam bikin. Piştî mehekê, du mehan, salekê can didin, îflas dikin û pênûs, komputer û daktîloyên xwe difiroşin. Mirov dikare navêe vanên bêkar, bêrojname û pênûsfirotî bîne ziman. Bêhesanî ev mînak, hem li welat hem jî li derveyî welat têne dîtin.

Di rewşa Kurdan a niha de, deranîna rojnameyeke Kurdî berxwedaneke mezin dixwaze. Li aliyekî pêkutiyên dijmin, li aliyê din jî tengasiyên diravî (maddî) û pêdivînedîtina weşandina berhemeke Kurdî. Hem bîr û baweriya bi armancên dozê hem jî roj bi roj nûkirina giyanê (ruhê) berxwedana li hemberî pestên dijmin û aloziyên diravî.

Dema ku xwendin û nivîsandina bi Kurdî li Tirkiyeyê û Kurdistanê qedexe bû niha jî di navbera serbestkirin û qedexekirinê de ye, gelek kes û koman ji bo weşandina berhemên bi Kurdî pozê xwe bilind kirin. Hinekan gava yekemîn avêtin, negihandin serî, "bilind firriyan nizm ketin". Elbete, kesên li ber xwe nedin nikarin di nava merc û hoyên dijwar de rûmet û nirxên neteweyî biparêzin. Bêguman, ji bo derhanîna rojnameyeke Kurdî, xwe ragirtin berî her tiştî pêdivî ye. Divê mirov bi dûrbîna Ewrûpiyan rojnamegeriya Kurdî nenirxîne.

Elbete, heke em kuştin, girtin, revandin û suîkasta li ser rojnamevanan bidin ber çavên xwe, emê bizanibin 100 hefte û 100 hejmarên **Welat** çawa hatine dagirtin.

Temenê Welat bû sed hefte. Di sed hefteyan de deranîna sed hejmarên rojnameyeke xwerû bi Kurdî, cihê şanazî û serbilindiyê ye.

Sed hefteyiya mamoste û dibistana me Welat, li xwendevan, nivîskar û gelê Kurd pîroz be!

## *Kongreya Pan-Afrîkanîstê şerê çekdarî rawestand*

Rêxistina radîkal ya reşikan, Kongreya Pan-Afrîkanîstê roja yekşemê (16'ê Rêbendanê) daxuyand ku, ji bo 3 mehan (heta bipaşketina hilbijartinê ku wê di 27'ê Avrêlê de pêk were) şerê çekdarî rawestandiye.

Serokê KPA'yê Clarence Makwetu, di civînek ji bo çapemeniyê de daxuyand ku, serokê rêxistina çekdarî yê girêdayiyê KPA'yê Artêşa Rizgariya Gelê Anzanyayê (ARGA) ferman daye şerkaran ku çekên xwe deynin. Makwetu wiha got: "KPA'yê ev moratoryama îlan kir ku helwesta me ya li hemberî aştiyê ku wê li pêkhatina hilbijartina azad re bibe bingeh."

KPA' rêxistina herî radîkal ya reşikan e. Di bernameya KPA'yê de daxwaza reforma erdan heye. Li Afrîkaya Başûr % 87 erdê bi jûn, di destê Spiyan de ye. Li gorî lêpirsîneke ku wan rojên paşin çêbû, wê di hilbijartinê de KNA (Kongreya Neteweyî ya Afrîkayê) %65 ray bistîne. Li gorî vê lêpirsînê rêjeya rayên KPA'yê %1.7'in, lê gelek kesên ku, rayê didin KNA'yê KPA'yê wek bijarteka duyemîn nîşan didin. KPA'yê di sala 1961'an de dest bi şerê çekdarî kiribû.

## *Li Londrayê şerê faşîst û antî-faşîstan*

Li gorî agahdariyên polîsan li Londrayê payitexta Brîtanyaya Mezinz nêzî 7 kesan hatin girtin, ji ber lihevxistina bi sedan antî-faşist û neo-naziyan. Roja 15'ê Rêbendanê li gelek cihên bajêr şer derket, di navbera van herdu gruban de. Li gorî eynî jêderan, li îstasyoneke binerd nêzî 400 neo-nazî civiyane û kevir, şûşe avêtine polîsan li ser vê yekê polîsek birîndar bûye.

Li aliyê din gurubek neo-faşîstî, êriş bir ser pirtûkfiroşgeheke "Alternatifan" li bajarê Nottînghamê, li vir jî 32 kes hatin girtin.


Li Ewrûpayê, di gel krîza aborî û bêkariyê, dijminetiya li hemberî biyaniyan, hêza neo-faşîstan jî zêde dibe.

## *Li Amerîkayê zelzele çêbû*

Li Eyaleta Californîa'yê li bajarê Los Ageles'ê roja 17'ê Rêbendanê hezek (zelzele) çêbû. Li gorî pîvana Richter'ê tundiya vê hezekê 6.6'e. Navenda zelzeleyê Geliyê San Fernandayê e ku, ji bakurê rojavayê Los Angeles'ê 32 km'yan dûr e, û li xwarê ye.

Li gorî agahiyên ajansan zelzele, serê sibê, seat li dora 4.30'an çêbû. Berfirehiya wê ji aliyê başûr ve 200 km û ji aliyê rojhilat ve 440 km'ye.

Di vê bûyerê de di gel 33 kesên ku mirin, zirareke mezin a darîngî jî çêbû. Li bajarê Los Angeles'ê gelek riyên navendî hatin girtin, av, gaz û telefon hatin birrîn, balefirgeha navneteweyî ya Los Angeles'ê jî hate girtin. Ji ber teqîna boriyên gazê, agir bi gelek malan ket.




### SÛRIYE

Welatê Sûrî, bi navê wê yê fermî Komara Ereban ya Sûriyeyê, li ser erdekî bi ber firehiya 185.180 km çarkoşe, ji 14 herêman pêk hatiye. Paytexta Sûriyeyê bajarê Şamê, zimanê fermî Erebî ye, erdê Sûriyê parçeyek ji Kurdistanê jî dihundirîne û li wir li dora du milyonan Kurd dijîn. Li gorî hejmarên ne fermî nifûsa Sûriyeyê digihîje 9 milyonî.

Sûriye dewleteke pirr ol û pirr netewe ye. Ji sedî 74 sunî misilman, % 16 Şiî û Durzî, Yezîdî, ji % 10 jî fileh in. Klîma Sûriyeyê ya Behra Spî ye, di sala 1961'an de Komara Surî ava bû. Di sala 1967'an de Çiyayê Golanê cihê stratejîk ji aliyê Îsraîl ve hate dagirkirin. Bi destê partiya BAAS'ê te birêvebirin

Dabara wê pirranî li ser hinartina (export) neftê ye, hilberînên din ev in: Zeytîn, ceh, genim, nîsk, riz, hinek fekî.

Sektora tûrîzmê jî li Sûriyeyê xurt e. Bendava li ser çemê Feradê pirr girîng e ji bo Sûriyeyê ji ber ku % 97 pêdiviya elektrîkê ji wir temîn dike. Problema di navbera Tirkiye û Sûriyeyê de li ser ava Ferad û Xabûr e.

# Hafiz el-Esad: 'Ma George Waşhington terorîst bû'


*Hafiz el-Esad (Şerê Sûriyeyê), teroristbûna rizgarîxwazên Filistînî nepejirand.*

■ **Zîrveya Clînton û Esad hat û derbas bû. Ji bo Clînton tiştê herî girîng ev bû ku, ji devê Esad normalîzekirina têkîliyên Suriyeyê û Îsraîl derket, li aliyê din Esad jî bi vê hevdîtinê, giraniya xwe ya di warê meşîna aştiya rojhilata navîn de da pejirandin û ji Clînton sozê alîkariyê stand.**

**Nûçeyên Derve-** Hevdîtina Serokê DYA'yê (Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê) Bill Clînton û Serokê Sûriyeyê Hafiz el-Esad ku roja 16'ê Rêbendanê li Paytexta Swisreyê, li Cenewreyê pêk hat, tu berhemên hêja nedan. Hevdîtin nêzî 5,5'an dom kir, piştî hevdîtinê, civînek ji bo çapemeniyê li dar ket.

Ev hevdîtin ji bo bipêşvebirina aştiya Rojhilata Navîn pêk hat. Wek tê zanîn Sûriyeyê ji ber ku, Îsraîl polîtîkaya xwe ya der heqê Çiyayên Golanê de, nediguherand, ji lihevrûniştinên aştiyê yên ku, li Washingtonê pêk dihatin vekişiyabû. Piştî morkirina Peymana Gazze û Erîxayê Sûriye zêdetir ji pêvajoya aştiyê dûr ketibû û daxuyandibû ku, heta Îsraîl sozêvekişîna ji Çiyayên Golanê nede, ev beşdarî civînên aştiyê nabe û wê alîkariya hemû rêxistinên ku li dijî vê peymanê têkoşîn dikin. Ev demeke dirêj e lê ku, heyetên DYA'yê diçin Sûriyeyê, lê dîsa jî navê terorîstî de ye û ambargoya aborî ya DYA'yê li ser e.

Ev hevdîtin ji bo germkirina têkîliyên herdu dewletan wek gava herî mezin tê pejirandin. Li gorî agahiyên ajansan, mijarên ku, li ser hatiye rawestîn ev in: Bi pêşvebirina pêvajoya aştiyê, germkirina têkîliyên Îsraîl û Sûriyeyê; li ser vê daxwaza Clînton, Esad e daxwaza xwe ya berê dubare kir û gote heke peymanek aştiyê pêk were tiştên ku dikevin ser Sûriyeyê,dê binin cih, Celintton jî sozê alikariyê di warê gihiştîna encameke erênî de da.

Clînton xwest ku, Sûriye alîkariya hêzên radîkalên Filistînî neke û ew wek rêxistinên terorîst dan nasîn, li ser vê yekê Esad daxuyand ku, ev rêxistin ne terorîst in, azadîxwaz in, û li dijî dagirkeriyê şer dikin. Dîsa got: "Ma George Washington û hevalên wî terorîst bûn."

Esad xwest ku navê Sûriyeyê ji lîsteya dewletên terorîst bê hildan, lê Amerîkayê, bersiveke erênî neda, Clînton jî xwest ku, Esad zorê bide Kadafî, der barê radestkirina tewanbarên bûyera Loekerbie, ku DYA û Îngilîz dixwazin bidarizînin.

Li ser mijara PKK'ê jî hate rawestin, li ser vê yekê jî Esed got: "Divê Tirkiye pêşî ewlekariya xwe, di nav erdê xwe de pêk bîne. Me hinek gav avêtine, em li hêviya encamê ne."

Li gorî agahdariya rayedarên DYA'yê ku roja 14'ê Rêbendanê dan, wê civîna aştiyê ya Îsraîl û Sûriyeyê di 24'ê Rêbendanê de pêk were, ji her aliyekî wê du kes beşdar bin, Ev jî dide nîşan ku, herdu alî jî zêde giraniyê nadin vê civînê, berê ji her alî 8 kes beşdarî civînê dibûn.

## Diway kûjiranî sê serkirdey fetih

**Nawenda Nûçeyan-** Rêkxirawî Rizgarîxwazî Felesthin tiwanî cê pencey ew tawanî kûştinane aşkira bikat ke lem diwayeda bû be mayey kûjranî sê serkirdeyan, ke ewaniş parêzer êbû Şaban û Esed Alseftawî û Mehmed Kehîl bûn. Eme û aşkerabû ke torêkî ıapakî Felestînî heye le berjewendî îstîxbaratî Îsraylî "mosad" le xeze, kardekat. Diway ew lêkolînewaney ke dû mang berdewam bû asayîşî Felestîn le nawxoda aşkray kird ke ew tore Fermanî le "Mosad" ewe wergirtuwe û destî be nexşe danan kirduwe. we asayîşî Felestînî twanî ew tore aşkira bikat.

**Rojnamey Al-Şeriq-Al-ewset**

*Lêpirsînek li ser xwendin û nivîsandina Kurdî — 5*

# Tesîra axaftina bi Kurdî pirr mezin e



**'JI BO KURDAN GIRÎNGIYA ZIMÊN NAYÊ MUNAQEŞEKIRIN'**

*Kadir Satik (Berpirsiyarê weşanxaneya KOMAL'ê)*

Ji bo Kurdan girîngiya zimên nayê munaqeşekirin

Pêşvebirina zimanê Kurdî, divê gavek di pêşiya têkoşîna rizgariya neteweyî de be. Pirsa ziman di pêvajokê de cihekî muhîm digire. Di vî cihî de rola ronakbîrên Kurd berpirsiyariyekê dixwaze.


Ronakbîrên Kurd bi Kurdî naxwînin, nanivîsin û bi Kurdî nafikirin. Li hember şerê tevahî şîara me hewce ye di ziman de jî "berxwedana tevahî" be.

Ji bo pêşvebirina zimanê Kurdî zimanê nivîskî cihekî muhîm digire, ji ber ku edebiyata Kurdî her bi zimanê devkî bûye.

Xebata yekîtiya ziman jî problemek e. Kovarên ku li ser huner, çand û siyasetê, pêwist e bi Kurdî bên nivîsandin. Gava ku mirov bala xwe dide muxalefeta neteweyî, pirtûk û kovarên bi Kurdî, cihekî pirr muhîm nagirin.

Xebata weşanxaneya me, Komal, ji bo pêşvebirina zimanê Kurdî heye. Ji qursên ziman, heta hînbûna alfabeyê, pirtûkên ji zarokan re û biryara berhemên edebî yê ku bi zimanê Tirkî hatine nivisandin, çapkirina gelek xebatên me dom dikin. Em vî karî li gorî îmkanên xwe yên aborî tînin cih.

Hewce ye ku em bala we bikşînin xaleke din jî, zimanê Kurdî, di têkiliyên rojane de jî gereke bê bikaranîn. Ji van têkiliyan yek jî, lazim e di saziyên Kurdistanê de bê çêkirin.



**'EM XWE JI QOPIYA RONAKBÎRÊN TIRK AZAD DIKIN'**

*Alî Ekber Oğuz (Serokê navçeya DEP'a Kadiköyê)*

Rola ronakbîrên Kurd hîn nehatiye kişfkirin. Lê têkoşîna 10 salên dawî, bêhtir qîmeta ronakbîran derxistiye pêş. Li ser girîngiya zimên, ronakbîrên Kurd, berî salên 80'yî, bala xwe nedidan ziman, lê ev yek jî hêdî hêdî tê guhertin.

Ronakbîrên Kurd, pirr di bin tesîra ronakbîrên Tirk de mane. Me (ronakbîrên Kurd) xwe wek qopiya ronabîrên Tirkan didît ji ber ku perwerdeyî bi zimanê Tirkî dihat kirin. Êdî fikriyata me jî bi Tirkî bû û bi rastî ev yek hîn didome. Nexwe em ne wek ronakbîrekî Kurd wek Tirkekî difikirîn.

Heke perwerdeyî bi Kurdî çêbibe (jixwe ev daxwaz ya gelê Kurd a demokratîk e) dê rojnameyên ku bi Kurdî diweşin jî pirr bên xwendin.

Ji bo vê yekê hewce ye ku ronakbîrên Kurd, saziyên xwe yên neteweyî amade bikin. Kadroyên teknîk jî bo pêşerojê bên amadekirin, ev wezîfe jî dîsa ya kadroyên ronakbîran e.

Ji bo ku zimanê Kurdî bala gel bikşîne, pêwist e bi tevgirêdan û li xwe xwedî derketinê (pirsa nasnameyê) mirov gel haydar bike.



**'RONAKBÎR WEZÎFA XWE TÎNIN CIH'**

*Yekbûn Civak*

Li gorî min ronakbîrên me, peywira xwe tînin cih. Lê gava ku bixwazin gavekê bavêjin, li dû jî tên girtin, ji bo vê yekê gelek ronakbîran wezîfa xwe baş neaniye cih.

Ev pesta dewletê, tesîrek mezin li ser ronakbîran kiriye. Lazim e em tim û car, alîkariyê bi gelê xwe re bikin, çi astengên ku li pêşiya ronakbîran derkeve jî ew nayê wê maneyê ku ew asteng wê helwesta ronkbîran bişikêne.



**'LI SER TÎPEKÊ LI HEV NAKIN'**

*Saniye Tunç*

Bi dîtina min ronakbîrên me, wezîfeya xwe baş nakin û neanîne cih. Wek ku hê jî ronakbîrên me di tîpekê de li hev nakin. Hê jî hinek tîpa 'ı' û hinek jî "î" yê çêdikin. Mirov nikare bibêje ku gelek tişt kirine.

Ronakbîrên me, yên vêga gere bi awayekî rêxisinî bixebitin û pêşî di warê zimên de alfabeyê tekûz bikin. Heke ew nebe pêşveçûn jî wê dijwar bibe.

Bi dîtina min, gava ku hevalên bi Kurdî dizanin, li her derê axaftina xwe bi Kurdî çêbikin, wê tesîreke mezin li ser wan kesên ku bi eslê xwe Kurd in, lê bi zimanê xwe nizanin, bike.

Bi vê nêrînê, wexta rojname û kovar jî zêde bibin wê ji bo fêrkirina gel, bibe navgînekê

Rojname û kovarên me yê ku dertên, lazim e zimên hinekî din hêsan bikin. Hêsan bûna ziman, bi dîtina min wê baştir bibe.



**'RONAKBÎR BI SER NEKETINE'**

*Aşkin Haskaya*

Ronakbîrên me bi ser neketine, ji ber ku wezîfeya xwe anîbûna cih wê niha me jî bi zimanê xwe bikaribûya bixwenda û binivîsanda.

Ronkbîrên me, wexta Komara Tirk ava bû, gere xwe nesipartana wê. Ev nebûya, ji bo çanda me, zimanê me têbikoşiyana wê bi ser ketana.

Gere jê neyê kerixandin, ronakbîrên me yên niha, bi ser vî karî ve herin û ji bo serkevtinê bixebitin. Bi dîtina min rojname û kovarên niha bi xwînê hatine çêbûn. Gere em wan biparêzin, ji bo rastnivîsê û alfabeyê jî hewce ye Enstûtî bêhtir bixebite û gelek zû berhemên fêrbûnê pêşkêşî gelê Kurd bike.

## Ku rewşenbîr jî nexwînin wê kî bixwîne?

Lêpirsîna ku berî çar hefteyan me dest pê kir û vê hejmarê dawî lê tînin, li ser xwendin û yan jî nexwendina Kurdî, tevî sersariya giştî, bala gelek kesan kişand ser vê pirsgirêka neteweyî. Bi bersivên ku me standin û bi helwesta kesên ku me xwest em bi wan bişêwirin, em gelek tiştên ku me xemgîn jî dike ,hînbûn, bûn şahîd. Divê mirov xwar rûnê û rast bibêje, her çiqas em ne bêhêvî ne û tu car emê dev ji înada xwe ya bicihkirina xwendina Kurdî bernedin jî, pêwist e em rastî û çewtiyên xwe bêtirs pêşkêşî hev bikin. Bi vê yekê em xemgîn jî bibin, ji bo pêşveçûyînê pêwist e em eyb û kêmasiyên hev veşêrin. Di dawiya vê lêpirsîna me de encamên nexweş derketin holê. Gotinên Serokê Komara Tirkiye yê berê Turgut Özal mixabin heta vêga nehatine petandin Turgut Özalê ku digot, "Bila hema Kurdî serbest bibe, çawa be Kurd bi zimanê xwe naxwînin" hê jî rastiya xwe diparêzin û bi vê yekê em pirr diêşin. Gelekî ku zincîrên xwe şikandine û dest bi têkoşîna hebûn û nebûnê kiriye pêwist bû ku îhtimal ji rastmayîna gotinên serokekî dewleta kedxwar re nehişta. Di înada gotinên wî de bûya jî, pêwist bû Kurdan, bi taybetî jî rewşenbîrên Kurdan bêrawestîn dest bi hînbûn û hînkirina xwendina zimanê xwe bikira.

Bes pirr mixabin gelek rewşenbîrên Kurd ên ku me xwest dîtina wan li ser vê pirsgirêkê bistînin, an bi Tirkî bersiva me didan an jî di ser guhên xwe re avêtin ev pirsên me.

Gotin û rexneyên me, pêwist e em careke din bidin kifşkirin, ne jî gel re, lê ji kesên xwende; ji nivîskar, rewşenbîr û xwendekaran re ne. Ta ku mirov tiştekî nede gel, mafê mirov tune tiştekî zêde jê bixwaze, bes rexneyên me li hember Kurdên xwende, bêqedar in. Di hêla Kurdî de ew berpirsiyariyên xwe neynin cih, di ser vê re jî dibêjin em bi Kurdî nizanin bixwînin û binivîsin.

Gelek nivîskarên bi eslê xwe Kurd –zehfê wan jî bi Kurdî baş dizanin– xebatên xwe yên li ser çand û bajarvaniya Kurdan bi zimanê Tirkî didomînin. Hin ji wan li ser ziman û berhemên wêjeyî yên Kurdî, dîsa tebatên xwe bi zimanê Tirkî dikin. Ew di berhemên xwe de li ser dewlemendiya zimanê Kurdî, li ser herikîna helbesta Kurdî û li ser pêwistiya xwendina Kurdî jî disekinin, bes ew bixwe bi Tirkî dixwînin, dinivîsin û ji sifirê ve dest bi hînbûna zimanê Ewrûpî jî dikin. Em hînbûna her zimanî normal û pêwist dibînin bes hînbûna zimanê neteweyî divê li pêşiya hemûyan be. Xwendin û nivîsandina bi Kurdî ji bo nivîskarên Kurd divê ne hobî lê pêdivî be.

Helbest em şertên ku gelê me tê de dijî û bêîmkaniyên rewşenbîrên Kurd di nav de ne dinasin. Û em dizanin ku ev pirs ta ku gelê Kurd di hêlên din de jî xwe serfiraz û azad neke, bi temamî çareser nabe, bes tiştê ku em dibêjin û diparêzin ev e: Ji vêga ve pêwist e em bingehekê ji bo pêşvebirina zimanê xwe û saziyên xwe yên neteweyî deynin. Ji bo vê jî pêwist e bi girîngî li ser zimanê Kurdî bê rawestin û qet nebe rewşenbîr nebêjin "Em nizanin bi Kurdî bixwînin û binivîsin."

**Neqtik**

*Befr katê twayewe ebê be aw belam mirov twayewe ebê be pêlaw.*

***Letîf Helmet (Helbestvanê Kurd)***

**KÊ ÇI PEKAND?**

**Ez nikarim lawê yekî ku Tirkiyeyê dixapîne, biwelidînim.**

*Nurdan Erbux (Jina berê ya Midurê Giştî yê ÎSKÎ Ergun Göknel)*



# Mihemedo lawo em baş in Eskero lawê min

Ji gundê Xedîrê xortek diçe leşkeriyê. Piştî demekî bêriya mala xwe dike û telefon dike. Mixabin li gundê lêwik tenê li mala mixtar telefon heye. Mala mixtar gazî diya lêwik dikin. Jê re dibêjin: "Were kurê te di telefonê de li benda te ye."

Diya lêwik bi lez û bez ta mala mixtar dibeze. Hema li derçika devê derî pêlavên xwe derdixe, destên xwe datîne ser hev, û wiha dibêje: "Mihemedo lawo, ez diya te me. Diya te bi qurbana te. Mihemed kurê min em baş in, meraqa me neke. Eskero lawo kurê min..."

Bi van gotinên jinikê zilamek zehf aciz dibe, bi milê jinikê digire û bi ser telefonê ve dehf dide.

– Tu bi kê re mijûl dibî Xwedê nehiştê. Ahîza telefonê bide ber guhê xwe, wisa bi kurê xwe re mijûl be. Tu bi dîwêr re mijûl dibî, kur jê xêrê nekirê."

# Diya wan ew kirin serbixwe

Qeza Konyayê Develî gihîşt mexseda xwe. Gelê Develî berî du heftan serî hildabû bi ser Enqerê ve ji bo bûna bajariyê. Di demên hilbijartinan de parlementerên heremî û yên din jî soz û peyman dabûn Develiyan ku wê bikin bajêr. Ji ber ku parlementer û hikûmet sozê xwe negirtin Deveilyê ne kirin bajar, gelê Develî parlementer û hikûmet protesto kirin

Gelê Develî ji gelek saziyên dewletê piştgir standin. Piştgiriya van saziyan gelê Develiyê piştzexmî kir, û cesaret da wan. Bi vî awayî gelê Develiyê roja 18'ê Rêbendanê ji navçeya Develî hatin Enqerê û li ber Serokwezaretê hikûmetê û demokrasiya hikûmetê protesto kirin.



Çiller xanim piştî sê seatan hat û mizgînî da wan:

Zarokino, lawên min!
Hûn azad in
Hûn bajarî ne êdî
Çavên we ronî bin!

Belê. Çavên wan ronî bin!

Tiştekî wek azadî û serxwebûnê xweş tune ye. Dema gelê Develî peymana Çiller Xanimê yan jî a diya xwe bihîstin zehf kêfxweş bûn û vegereyan bajarê xwe.

Me got diya wan. Ma, hekaretek e gelo?

Nexêr. Ev wek hekaretê tu car nayê hesibandin û diya wan e jî. Ku ne diya wan bûya, di du heftan de mafê wan nedida wan.

Di hilbijartinan de gelek soz û peyman dabûn gelê Kurd jî ku realîte, maf, nasname, dibistan û hwd... dê bên naskirin. Ev sozên han ji teref Silêman Demîrel ve hatibûn dayîn. Dema hat hilbijartin û bû serokwezîr, Kurdan baş nas kir. Mafê Kurdan tev wek xîçikekî dîtin û tim di devê xwe de digerand ku xîçikek jî em nadin Kurdan û ji berê behtir bi ser Kurdan ve top û tanqên xwe şandin, qetlîam zêde kirin, ji gundan bêhtir li qezayan qetlîaman kirin, doh Licê û îro li Cizîrê qirqirin. Xan û xanî şewitandin mal, terş û talan kirin.

Ev e hemwelatîbûna yekemîn?

Ma Dewlet, hemwelatiyên xwe yên yekemîn dikujin?


Ku Kurd hemwelatiyên yekemîn bin, Tirk yên çendan in?

Çawa dibe qezayek di navbeyna du hefteyan de digihîje maf?

Peymanên ku dabûn Kurdan ev du sal in yek bi tenê jî ne hatiye cih, Minak tabelaya Enstîtuya Kurdî hêj jî qedexe ye ku bê daleqandin

**S.S.Dilpolo**

**Jûjî... Doğan Güzel**



Di hilbijartina dawî de hilbijêrên neqeydkirî pirr ray bi HEP'ê dan windakirin. Ji bo ku DEP jî nekeve rewşa HEP'ê bi girîngî li ser vê meseleyê disekine. Bes di dawiya lêpirsîna me de ev encam derket:

# Zehfê hilbijêrên DEP'ê neqeydkirî ne!

**Zana Farqînî**

Partiya Demokrasiyê (DEP) ji bo çepera ku dewlet li dora wan teng dike bişkêne, lijneyên (heyetên) xwe verêyî Ewrûpayê kirin. Ji wan di dema hilbijartinan de lijneyên çavdêr û nêrevan dixwaze û endîşeyên xwe yên ku wê hîle û fen bikevine hilbijartinan, dide diyarkirin.

Lê li aliyê din li gorî agahiyên ku radigihînin me, yên em pê dihesin û vekolîn û xebatên me, mijarekê derdixin roniyê. Li gelek bajarên Tirkiyeyê yên mezin û yên Kurdistanê, kesên ku wek hilbijêrên DEP'ê tên qebûlkirin bêqeyd in. Navên wan di lîsteya hilbijêran de nîn in, kitm in.

Me bi vê mebestê ji serok, rayedar û endamên DEP'ê yên bajêr wek Îzmîr, Amed, Edene, Batman, Gazîosmanpaşa û Güngörenê pirsî û lêkolîn pêk anîn. Derkete rastê ku gelek kesên wek hilbijêrên DEP'ê ji ber koçberîtî, neqeydkirîbûnê û ji ber helwesta karmend (memûr) ên hilbijartinê ku bi zanebûn navên Kurdan nenivisîne, kitm in û bi vî awayî nikarin di hilbijartina 27'ê Adarê de ray biavêj in.

DEP'van bi bersivên xwe yên li ser pirsa me didine xuyan ku piştî lîsteya hilbijêran li muxtariyan bê daleqandin wê ji rewşê hîn bêhtir agahdar bibin, navan tesbît bikin û piştre ji bo qeydkirina hilbijêrên xwe serî li Lijneya Hilbijartinê ya Bilind bidin.

**Hejmarvanê DEP'a Bajêr yê Amedê Hamza Akalin** diyar dike ku li Amedê 30 hezar kes bêqeyd in û dadixuyîne ku lîste bê daleqandin hejmar dê hîn bêhtir bibe.

Ev rewş ne tenê ji bo Amedê, ji bo bajarên mezin ên Tirkiyeyê û Kurdistanê jî wisa ye ku gelek kesên xwe li devera xwe qeyd kirine, ji ber û pêkutiya dewletê ji mecbûrî koçî deverên din dibin.

Hefteya çûyî **Serokê DEP'a Stenbolê Kemal Parlak** pirsa me dibersivand û dida nîşan ku li Stenbolê wê karibin serokatiya 5-6 belediyan bistînin.

Mersîn ku % 50 nifûsa wê Kurd e îhtimala bi dest xistina 2-3 belediyan ji aliyê DEP'ê ve heye, lê me li gel hemû hewlan xwe negihande rêxistina bajêr. Li wir jî li gorî agahiyên ku gihane me % 30 kesên wek hilbijêrên DEP'ê bêqeyd in û gelek kesên koçber di dema nivisandina hilbijêran de nehatine qeydkirin.

Kurd li taxên Mersînê wek **Çaymahalesî, Sîteler, Gündoğdu, Yenîpazar, Selçuklar, Barbaros** gelek xurt in.

Rewşa Partiya Demokrasiyê li gorî lêkolînên me li Edenê, ji hemû partiyên pergalê (sîstemê) baştir e û li navçeyên wê **Seyhan, Ceyhan, Yüregîr**, nehiyên wê **Yakapinar, Abdioğlu, Doğankent, Küçükdikili, Yunusoğlu** û ji bo bidestxistina serokatiya belediya mezin a bajêr jî bi îdea ne.

Li Îzmîrê jî rewşa hilbijêrên DEP'ê yên neqeydkirî rayedarên wê difikirîne. **Serokê DEP'a Îzmirê Hîkmet Fîdan** ji me re daxuyand ku DEP li Îzmîrê li navçeya **Konak, Karşiyaka, Buca** û serokatiya belediya mezin a bajêr xwedî îdia ye, her wiha li Herêma Egeyê jî da diyarkirin ku xurt in, wek **Turgutlu, Akhîsar, Asurlika Menemenê, Sağulucaya Sökeya Aydinê.**

Li jêrê kesên ku pirsên me yên li ser rewşa kesên neqeydkirî bersivandin, diweşînin.

**"BI QESTÎ JÎ NAV NEHATINE NIVISANDIN**

*Müslüm Kurucu (Serokê DEP'a Edenê ya Bajêr)*

" Şixulê me tê kirin. Di 24'ê vê mehê de wê kutikên hilbijêran were daleqandin. Ên ku nehatibin qeydkirin emê tesbît bikin. Û ji bo ku wan qeyd bikin mureceet bikin.

Pirr malan zeman nedîtine. Gelek jî bi qestî navên wan nehatine qeydkirin. Ev jî heye ku gelek însan piştî qeydiya hilbijêran hatine. Ji aliyê **Muşê, Diyarbekir, Sêrt, Mêrdîn** û yên din.

Tev ji malên wan hatine şewitandin, hilweşandin û hatine cem eqrebeyên xwe."

**"NEQEYÎDÎBÛN JI BÊELEQEYA ME YE JÎ"**

*Ahmet Turandemîr (Endamê Lîjneya Rêveberiya DEP'a bajarê Îzmîrê)*

"Bi qismî bi awayekî zanebûn hilbijêrên me nehatine qeydkirin. Ji aliyê din ve eyk ji ber bêeleqebûna hilbijêrên me jî tê.

Di dema ku kutikên hilbijêran bê daleqandin emê bi ekîbên xwe yên navçeyan ve navan tesbît bikin û ji nû ve yên kitm binivîsin

Mînak li Îzmîrê li navçeyên wek **Konak** û **Gaziemîrê** potansiyeleke me yî mezin a rayan heye. Heke hilbijartin bi adîlane bê kirin û xebatên me baş henrin, bi îhtimaleke mizin emê bi ser kevin."

**"30 HEZAR KES BÊQEYD IN"**

Hemza Akalin (Hejmarvanê DEP'a bajêr yê Amedê)

"Gelek însanên me yên neqeydkirî hene. Em di nav xelkê û rêxistinê girseyî yên demokratîk de xebatê dikin. Em ji însanê xwe re, welatparêzan re dibêjin bila xwe qeyd bikin.

Hûn jî dizanin pêkutiya dewletê li ser me heye, însanên me tên kuştin, lewma xelk ji me ditirsin. Xwe dûrî me didin. Li Diyarbekirê tiştê ku em pê hesiyane 30 hezar kes bêqeyd in. Ev yek ji ber çi tê, em jî baş nizanin. Wan xwe qeyd nekirine an jî nehatine qeydkirin em baş nizanin. Wê di 24'ê hîvê (mehê) de lîste bêne daleqandin, emê jî baş hîn bibin û dest bi xebata qeydkirinê bikin"

**"DI MALEKÊ DE JI 20 KESAN 18 KES NEQEYDKIRÎ BÛN"**

*Selahettîn Okçoğlu (Endamê DEP'a Günörenê)*

" Ên ku koç dikin, hem ji ber malnedîtinê û hem jî ji ber meseleyên aborî, xwe qeydnekirin, ji wan re pirr ne girîng e.

DEP ji ber bêîmkaniyan û pesta dewletê di karê qeydkirinê de wezîfeya xwe baş nikare bîne cih.

Mesela di hilbijartina 1992'yan de ji bo belediyan wek hilbijêrên HEP'ê di malekê de ji 20 kesan 18 kes bêqeyd bûn."

**"LI NAV SÎNORÊ NAVÇEYA ME NEQEYDKIRÎ PIRR IN"**

*Hüseyîn Yüce (Sekreterê Navçeya Gazîosmanpaşayê yê DEP'ê)*

"Li nav sînorê navçeya me gelek kesên neqeydkirî hene. Wek **Yenîmahale, Kazimkarabekir, Çukurçeşme** ku bi pirranî xortên Kurd ên ezep lê dimînin.

Ji ber koçan jî gelek hilbijêrên me wek bêqeyd in. Mînak gundiyên gundê mebûsê me **Nîzamettin Toğuç** bi giştî hatine Stenbolê navçeya me, ba eqrebeyên xwe. Ji aliyê din ve jî gel koçberî vê hêlê dibe.

Amadehiyên me didomin. Komîteyên taxan ku wezifeya wan ev e ji bo tesbîtkirina navên neqeydkirî xebatan dikin. Piştî ku lîste hatin dalqandin, di wê dema ku muhleta wê heye, emê serî li Lîjneya Hilbijartinê ya Bilind bixin."

**"BI QESTÎ HINEK CIH NEHATIN NIVISANDIN"**

*Oktay Bahadir (Serokê DEP'a bajêr yê Batmanê)*

"Nexweşî bi her awayî li Batmanê tên tetbîqkirin. Ji her tiştî re bûye pilot. Pêşî li vir tên ceribandin.

Li ser kesên neqeydkirî jî, li her bajarê mezin bi qestî hinek cih nehatine nivisandin. Ew roj herkes di mala xwe de bû. Îhmalî jî heye.

Piştî ku gund xera dikin, hilbijêrên me jî ji cihên xwe dibin, tên li Batmanê bi cih dibin. Em jî baş nizanin ku hejmara wan çi qas e. Lê xebatên me dewam dikin. Em dibêjin serfirazî ya me ye"



*Leyla Zana di şahiyeke DEP'ê de*

# Li Serhedê zilma Romê

**Melazgir, Welat–** Ji bo Kurdan nasnameya wan, her diçe dibe barekî giran û belayên mezin tîne serê wan. Ji bo Kurdan jiyana li gundekî Kurdistanê, êdî bi mirinê re yek wate ye.

Li Serhedê gundiyek ku mala wî hatiye şewitandin wiha dibêje: "Hêzên KT'ê ji dewletên ecnebî û ji zivistana welatê Serhedê hêz girtin, weke hovan êrîşî gundên weletparêzan kirin û ji me pirsîn, gotin: "Hûn Kurd in ne?" Me jî got: "Belê..." Gotin: "Wisa be du rê hene li pêşiya we, an mirin, an jî mirin." Yanî an mirin an jî hûn dê çekên dewletê hilgirin û bibin cerdevan."

Emrê dijmin ê li Kurdistanê çiqas kin dibe, ewqas xedar û zalim dibe. Piştî Botanê, niha jî berê xwe dane Serhedê. Weke Cizîrê, Şirnexê û Licê, niha Zengok û Melazgira dîrokî dişewitînin. Armanc valakirina gundên welatparêzan e.

An mirin, an jîi mirin!....

Gundiyek ji hêla Tendurekê zilma dijmin wiha tîne ziman: "Bi panzer û erebeyên qomando, tîm û leşkeran êrîşî ser me kirin. Li malên gund geriyan, mal ser û binî hev kirin. Şeş–heft heb ji wan hatin mala min jî. Li ber çavên zarokên min li min dan.

Dijûnên pîreka min kirin. Zarokên min kirin qêrîn û xwe avêtine ser min. Leşkerên Romê, ew jî dan ber qûndaxên tivingan. Ji min re gotin: "Ma xweş e ku hûn jî dibêjin em Kurd in." Ez hê di nav dest û piyên wan de bûm, min dît ku agir bi loda giyayên min hildikişe. Hişê min ji serêmin çû. Min got: "Wê heywanên me vê zivistanê ji birçîna bimirin. Erê hûn neyarên Kurdan in; lê heywanên bêzar û ziman çi bi we kirine." Bi van gotinên min re dengê teqîna tivingan ji tewleya min hat. Biteqînê re jî bû orîn û nalîna heywanan. Ewên ku li min didan, bi min kenîn, gotin:

"Tişt nabe, tişt nabe, em heywanên te birçî nahêlin, emê wan ji te re bikin qelî ku tu heya biharê bixwî." Dîsa li min dan, serê min kirin nava berfê, bedena min di bin lêngên wan de diperçiqî. Ez seran pê tevizîbûm. Min hew dizanibû ku ez bêreh im. Dema serê min ji bin berfê derxistin, min dît ku agir bi tewlê ji xistine. Ez nizanim wê rewşê çawa bînim ziman. Heywanên sax û birîndar hebûn di tewlê de. Ore ora conegan û çelekên bi golik bû, ji aliyikê ve jî, ji tewlê xwîn dikişiya ser berfa spî. Heywanên min bi saxîtî şewitandin."

Tevî hemû hovîtiyên bi vî awayî, em dibînin ku dewletên dinyayê çavên xwe ji vê zilmê re girtine. Ji bo ku bikaribin çek û panzeran bifiroşin Tirkiyeyê.

Ev zilma dewletê ya li ser gundên Serhedê didome. Dixwazin gundiyan bikin cerdevan. An jî tenê riya koçberiyê li ber wan dihêlin.

# Aydinlik îtîrafên Cem Ersever diweşîne

**Navenda Nûçeyan–** Rojnameya "Aydinlik'ê" dest bi weşandina beşa duyemîn a roportaja bi Ahmet Cem Ersever re kir. Di beşa duyemîn a roportajê de, ji devê Ersever îtîrafên gelek cinayetên kontrgerîla têne kirin û kiryarên van cînayetan têne beyankirin.

Rojnamevan Soner Yalçin roportaja xwe ya ku beriya kuştina wî bi Cem Ersever re pêk anîbû, bi awayekî rêzenivîsî di rojnameya Aydinlik'ê de diweşîne. Di roportajê de ji bo isbata hebûna kontrgerîla îtîrafên gelek girîng cih digirin. Li aliyê din, di avakirina şebekeyên kontrgerîla û di pêkanîna cinayetan de, navên îtîrafkaran derdikeve pêş. Li gor beyanên Cem Ersever, endamên kontgerîla bi giranî ji elemanên îstîxbarata cendirmeyan (JÎTEM) û ji îtîrafkaran hatine hilbijartin. Di nava îtîrafkaran de jî, navên Alaattîn Kanat û Adem Yakin bêhtir derdikevin pêş. Weke tê zanîn Ahmet Cem Ersevser jî avakar û Serokê JÎTEM'ê bû û ji ber hin dijberiyên di navbera wî û artêşê de ji wezîfeya xwe îstîfa kiribû. Dû re jî tevî çend hevalên xwe bi destê dewletê hatibû kuştin.

Cem Ersever di roportajê de, navên qatilên Mehmet Sîncar, jî dide. Li gorî beyana Ersever qatilê Mehmet Sîncar îtîrfakar Adem Yakin e. Adem Yakin jî di grûba Alaattîn Kanat de ye û di pirraniya cinayetan de rola vê grûbê heye.

Alaattîn Kanat ji aliyê Cem Ersever ve, weke serokê îtîrafkaran tê navandin û têkiliyên wî û dewletê têne tesbîtkirin. Cem Ersever di roportaja xwe ya di Aydinlik'ê de li ser Alaattîn Kanat wiha dibêje: "Alaattîn Kanat îro li Diyarbekirê, di lojmanên Walîtiya Rêveberiya Taybetî de dimîne, ev lojman li taxa "Kurtoğlu" ne, jina Alaalltîn Kanat hemşîre ye, di lojmanê de bi hev re dimînin.

Grûbeke Alaattîn Kanat ê ji 30–40 îtîrafkaran pêkhatî heye. Wî ew grûba li girtîgeha Diyarbekir di kawişa îtîrafkaran de pêk anî, çi cara ku yekî nû were girtîgehê, ew lê dixebitin ku wî jî bixin nava grûbê."

# Qatil kî ye?


Karsazê Kurd Behçet Cantürk tevî şoferê xwe Racep Kuzucu di 16'ê Rêbendanê de li hêla Sapanca'yê ji aliyê kesên tarî ve hate kuştin. Behcet Cantürk wek mirovekî welatparêz û fedekar dihate nasîn. Li aliyê din heta 6 meh berê jî, yek ji şirîkên rojnameya Özgür Gündem'ê bû.

Kuştina Behcet Cantürk, di rojname û televizyonên Tirk de bi senaryoyên ku ji destê Emniyeta Tirkiyeyê derketine tê belavkirin. Li gorî îdiayên medyaya (çapemeniya) Tirk, kuştina Behcet Cantürk, encama şerê di nava mafyayê de ye. Ji bo xurtkirina vê îdiayê jî gelek senaryo di çapemeniya Tirk, de têne weşandin. Lê ev senaryoyên ku têne weşandin kifş e ku ji navendekê dertên û têne belavkirin, armanc jî veşartina hin rastiyan e. Jixwe malbata Cantürk ji daxuyand ku, kuştina Behcet Cantürk ne ji ber şerê di nava mafyayê de ye û ew bi xwe qatil dinasîn.

### DI KUŞTINA CANTÜRK DE TILIYA DEWLETÊ

Li aliyê din rojnameya Aydinlik'ê nûçeyek weşand û ji devê hin rayedarên Emniyeta Tirkiyeyê îdiayên nû avêtin holê. Li gorî ew kesên ku beyan dane Aydinlik'ê, Serokê Giştî yê Emniyetê Mehmet Ağar, kuştina Behcet Cantürk organîze kiriye û bi vê yekê jî xwestiye mafya Kurd û Tirk berî hev bide.

Li gorî ku Aydinlik dinivîse, hemû telefonên Behcet Cantürk ji 3 mehan bi vir ve bêyî destûra mehkemeyê ji aliyê Mehmet Ağar ve dihatin guhdarîkirin û bi alîkariya mafyaya Tirk û Ülkücüyan li dû wî digeriyan. Di vê navê de ji bo pevçûnek di navbera mafyaya Kurd û Tirk de derbikeve, ji herdu aliyan re jî agahiyên nerast dihatin şandin. Bi gotina ew kesên ku beyan dane Aydinlik'ê, malbata Cantürk jî bi qatil nizane û ji aliyê emniyetê ve bi agahiyên çewt berê wan didin hedefên nerast.



*Behçet Cantürk*

# NÊRÎNEK

**Îbrahîm Xort**

## Şer û zivistan

Şer kete nav deh saliya xwe. Ev şer şerekî dijwar e. Ev, şerekî mayîn û nemayînê ye. Û ev şer şerekî xîretiyê û bêxîretyê ye!

Gava ku em li van deh salan dinêrin, şer yek caran weke ku sar dibe û yek caran jî, weke hêtûnê germ dibe. Carina jî, weke ku li paş dikeve. Lê ji gava ku şer dest pê kiriye heta îro, bi geşbûn û hilkişîne re, her roj, bi mewziyên xwe yên nû bi pêş dikeve. Ev rastî, li gorî bingeha ku armanc li ser rûniştiye forma xwe wê bibîne. Ev form jî, ger li gor rastiyên civakî hatibin tehlîlkirin wê cihê xwe di nava civaka xwe de bigire.

Di têkoşîna gelan de, her mewsîm li gorî erdnîgariya (cografya) xwe tê wateyekê û li gorî vê wateyê livbaziyên xwe yan kêm yan jî, zêde dikin. Ger em mînakekê bidin di nava civakên filehan de mewsîma zivistanê, (bi giranî jî, sersalê) ji bo wan pîroz e. Ew jî, li gorî vê pîrozbûn êrîşên xwe carina kêm carina jî zêde û carina jî qet nakin. Di nava civakên misilmanan de jî, li gorî cejnên olî (dînî) em dikarin vê rastiyê bibînin. Ji bilî van mewsîman jî, rojên taybetî hene. Di van rojan de, hemû hêzên endamê civakê, li gorî van baweriyan dimeşin.

Em li baweriya civaka Tirkan û dewleta Tirkan dinêrin, kar û xebatên wan, jiyana wan, bîr û ne li ser qeîdeyên îslamî rûdinin. Ka em çi navî baweriya wan û êrîşên wan, ne li ser qeîdeya filetiyê û li vê rewşê bikin. Yek nav dimine li gorî bi şêxsiyetiyê. Yan jî, şexsiyeteke arabesk!

Her roj em tiştekî ji devê nûnerên dewletê dibihîzin. Rojeke wan, rojeke wan nagire! Her yek ji wan, tiştekî dibêje. Û kî çi dike, dike! Kes nabêje ka te çi got û te çi çima kir?! Her kes bi serê xwe bûye dewlet û xwediyê hêzekê! Yanê di nava dewletê de anarşiyek heye.

Helbet ev anarşiya nava dewletê, ne ji ezmanan bariye, seranser bandora têkoşîna rizgariya gel e. Ji aliyekî ev têkoşîn bi pêş dikeve û ji aliyekî dewlet hîn bêhtir dikeve nava tevliheviyê. Ev tevlihevî jî, ne di nava qadên dewletê tenê de ye. Di nava hemû qadên civakê de, xwe xuya dike. Ev tevlihevî dibe mizgîniya rojên zelal.

Zelalbûn jî, li dûv tevliheviyekê incax karibe li ser bingehekê rûne. Di têkoşîna gelan de, ev demên girikî û zelal, li gorî bingeha têkoşînê formekê digire.

Li Kurdistanê jî, ev dem hate jiyên. Dema ku têkoşîna çekdarî nû dest pê kir, pirr kesan nizanîbûn bê wê çi bidin û çi bikin. Her ku têkoşîn bi pêş ket, kesan jî, cihê xwe hîn bêhtir xuya kir. Di demeke kin de pirr kesan jî digotin, ev bûyerin eşqiyatiyê ne, hin kesan digotin, ev bûyerên ku dewlet çêdikin in. Welhasil ji her seriyekî dengek...

Lê îro, ev pirdengiya li dijî têkoşînê û nebaş, cihê xwe ji yek serî û yek dengiyê re hiştiye. Yekîtiyek dîrokî, yekîtiyek tijî hêvî û yekîtiyeke ku gav bi gav ber bi rojên azad ve diçe.

Jixwe mirov bi çavekî objektîf binêre, ev êrîşên dewletê wê hîn bêhtir zelal bibin. Bi giranî jî, gotinên nûnerên dewleta dagirker ku dibêjin vê zivistanê emê ve terorê (!) bisekinînin jî, ji vê yekîtiya gelê Kurd tê. Hemû êrîş, ji bo ku vê yekîtiyê belav bikin û kambaxkirin û şewitandina gundan, navçeyên bi çûk û çend proweyên li bajaran jî, ne derveyî vê armanca dewletê ne!

Mirov bala xwe bide van êrîşan, hemû êrîş, li cihên ku ji destê dewletê derketî ne, çêdibin. Yanê dewletê ev deveran ji çavê xwe derxistine û li gorî wê êrîş dike, kambax dike û dişewitîne. Weke ku bibêje cihê ku ji min re nebe ez jî, ji kesî re nahêlim! Her deverê welêt, dide ber top û tanqan, dide ber potînên leşkerên hovane û nexweş! Tu dewletan welatê xwe hewqasî tar û mar nekiriye. Ev jî vê rastiyê datîne ber çavên me: Wê gavê dixuye ew dever, ne Tirkî ne!

Li dijî ewqas êrîş, gel him, li xwe û him jî li welatê xwe, xwedî derdikeve. Ev xwedî derketin, di binê siya darê tifinga lehangan de hîn bêtir dibe xwedî wateyeke dîrokî û li ser bingeheke qewîm rûdine.

Dewlet bi hemû hêzên xwe yê teknîkî aborî, leşkerî û hwd. di vê zivistanê de êrîş dike û hîn jî, wê bike. Lê ev êrîş, wê bibe weke êrîşên dûvpiştkê, xwe xelas bike.

Tu teknîk, tu aborî, tu leşkeriya bi zorê û hwd. nikare bibe weke baweriya gerîlyan. Zivistan jî...

*Di salvegera sedemîn a bûyîna wî de çend gotin li ser*

# HELBESTVANIYA CELADET BEDIRXAN

**Felat Dilgeş**

*Dê hilînim doza te jî*
*(Hawar, hejmar 2, r.2)*

Dema ku mirov beşdarbûna Celadet Bedirxan a Şerê Cîhanê yê Yekemîn bîne bîra xwe; ji bo rizgarkirina welat, divê hilgirtina wî ya top û tifingê û standina tola welat pirr xerîb neyê. Lewre ew di **Serhildana Agiriyê** de jî, ji bo standina tola welat li paş nemabû.

Bêguman Celadet Bedirxan, bi tenê helbestên bi qafiye nenivîsî; di warê helbesta Kurdî ya hemdem de jî ceribandinên wî çêbûn. Helbesta wî ya bi navê "**Bilûra Min**" di vî warî de nimûneyek girîng e. Hîmên helbesta Kurdî ya hemdem, em di vê helbesta Celadet Bedirxan a ku serbest nivîsiye de, dibînin. Ew, di helbesta Bilûra Min de wiha dinivîse:

*Bilûra min a şîrîn*
*Tu di sariya sibehê*
*Û hingura êvarê de*
*Hevalê bêhevalan*
*Destbirayê şivan û dilketiyan î.*
*Dengê te,*
*Hêstirên dilên xemgiran*
*Silava ji hev veqetiyan*
*Tîne bîra min.*
*Bilûra min tu yî*
*Xemrevîna terkeserên dinyayê.*

*Bilûra min,*
*Dengê xwe berde!*
*Dinya,*
*Mîna zarokekî berşîr*
*Ket dergûşa xwe*
*Dengê xwe berde bilûra min*
*Û jê re bilorîne!*
*Bilûra min tu yî*
*(Hawar, hejmar 32, r.14)*

Xebata Celadet Bedirxan a nivîskî bi pirranî pexşan (nesîr) bû. Ew, pêşkêş û hostayekî bêhempa yê pexşana Kurdî bû. Zimanê wî yê şîrîn, salix û îmgeya ku di nivîsê xwe de bi kar dianî, xweşî û dewlemendiya zimanê Kurdî radixist ber çavan. Celadet Bedirxan zimanzan bû; lê belê bilbilekî zimanê Kurdî bû. Celadet Bedirxan berhemên xwe bi **Kurdî, Fransizî û Tirkî** dan. Lê belê xebatên wî yên bingehîn bi zimanê Kurdî bûn. Di jiyana xwe ya edebî û siyasî de bi gelek navan nivîsî. Çend navên ku di nivîsên xwe de bi kar dianîn wiha bûn: **Herekol Ezîzan, Xwediyê Hawarê, Stranvan, Stranvanê Hawarê, Bavê Cemşîd, Bavê Cemşîd û Sînemxanê, Seydayê Gerok, Ronahî, Xeberguhêz, Nêrevan** û **Dr. Bilêç Şêrkoh**. Celadet Alî Bedirxan, di roja 15.7.1951'an de, li gundê **Hêcanê** (Nêzîkî Şamê ye), bi qezayeke bêoxir ji nav me koç kir. Hê gelek tiştên ku di wî ji bo gelê xwe bikira hebûn; lê çi heyf e ku Bîra Qederê, ji bo wî bû gora qederê. Di salvegera sedemîn a hatina wî ya dinê de, ez bi giramgirî wî bi bîr tînim.

***Çend berhemên wî yên ku çap bûne û tên zanîn ev in:***

1. Alfabeya Kurdî
2. Rêzimana Kurdî (Bi Rojhilatnas Roger Lescot re)
3. Ferhenga Kurdî
4. Doza Kurdî (Le question Kurde– Bi Fransizî)
5. Ji Mustafa Kemal re Name
6. Edirne Sükûtunun İçyüzü (Rûyê esasî yê bêdengiya Edîrneyê)
7. Rûpelên Alfabeyê

Celadet Alî Bedirxan, xwedî taybetiyeke pirralî bû. Ji berhevkirina stranên Kurdî yên kevin bigire heta metelok û çîrokan, nivîsîna serborî û helbestan, di gelek waran de xebatên wî hebûn. Bavê Celadet, Emîn Alî bi xwe jî helbestvan bû. **Emîn Alî Bedirxan**, di dema çapkirina rojnameya Kurdî ya yekemîn **Kurdistanê** de jî nivîs û helbest ji birayê xwe yê biçûk **Miqdat Mîthad Bedirxan** re dişandin. Emîn Alî, ew nivîsên xwe ne bi navê xwe yê rastîn, ji ber ku memûrê dewletê bû, bi navê mustear dişandin. Di hejmara sêyemîn a rojnameya **Roja Nû** de, Celadet Bedirxan li ser çapkirina rojnameya Kurdistanê disekine û helbestek ku bavê wî, j apê wî Mîqdat Mîthad re şandiye, diweşîne. Helbest wiha ye:

*Pêrûz ji te re hezar cara*
*Ev deng e niha li nav yara*
*Mizgîniya vê cerîdeya qenc*
*Şabaş dibitin çiqas hebit genc*
*Ev şixlê mezin te kiriye bidet*
*Cara ewilî te kiriye him–met*
*Ev rêbera qenc te danî binyat*
*Kirmanc hemî te kirine îrşat*
*Vê mehrîfetê tucar nehêle*
*Daim ji te re mîim resûl e.*
*Roja ku cerîde têtе bazar*
*Çiqas hebitin li şehrî ekrad*
*Qewlê xweşiya te kirine mi'tat*
*Rûnahiya bab û kal û ecdad*
*Pê vê hinerê te kir niho şad*
*Beybûniya dewleta te geş bit*
*Qasî tu hebî dilê te xweş bit.*

Emî Alî Bedirxan, ev helbesta xwe bi navê **Lawê Şêx E. Fetah** nivîsiye. Wisa xuya ye ku "giyana helbestvaniyê" ji Celadet û Kamûran re, ji bavê wan mîras dimîne. Hem Celadet û hem jî Kamûran herdu jî helbestvan in. Lê belê Kamûran, ji Celadet Bedirxan bêhtir li ser helbestê xebitiye û di vî warî de berhem dane. Kamûran Bedirxan, **Çarîneyên Omer Heyam** jî wergerandine Kurdî û ev çarîneyên xweş, di nav rûpelên **Hawarê** de dane çapkirin.

Celadet Bedirxan, helbestên xwe bi pirranî bi qafiye di nivîsî û binaverokeke neteweyî ev xebata xwe domand. Di hin helbestên wî yên ku di "Stûna Zarowan" a Hawarê de nivîsî, zimanekî sivik û bi qafiye bi kar anî. Di helbesta wî de evîna welat, karekterê neteweyî yê Kurdan, welatperwerî û daxwaza rizgariya gelê Kurd, her dem di pêş de bû. Di helbestê de zimanê wî sivik û herikbar e. Naveroka helbesta wî dewlemend, mesaja wî zizelal e. Celadet Bedirxan di helbesta xwe de carina jî di deriyê evînê de li hêviyê dipirse. Ew, di helbesta xwe ya bi navê "Buhar" de bi vî awayî dinivîse:

*Berf dihele li zozan*
*Stirî şîn in li deştan*
*Kulîlk hêj nuh şepal in*
*Gul û bilbil heval in*
*Buhar e nuh buhar e*
*Tebîet giş li kar e*
(Hawar, hejmar 1, r.5)

Di helbesta xwe ya bi navê tola welat de jî bi vî awayî dinivîse:

*Welat! Welat! Kanî xweş î?*
*Qewî îro tu nexweş î*

*Kanî ew ken, kanî geşî?*
*Çima wilo wek dilreş î*

*Destên Tirk e li te ketin*
*Bi xwîna sor bûn rep in*

*Ez Kurd im ji bîr nakim*
*Bi xwîna xwe divê rakim*

*Ez bixwînim, xwende bibim*
*Mezin bibim, zana bibim*

*Mêrkuj bibim bi nav û deng*
*Ez hilgirim top û tifeng*

*Tola te jî evda te jî*



■ Celadet Bedirxan, helbestên xwe bi pirranî bi qafiye dinivîsî û bi naverokeke neteweyî ev xebata xwe domand. Di hin helbestên wî yên ku di "Stûna Zarowan" a Hawarê de nivîsî, zimanekî sivik û bi qafiye bi kar anî. Di helbesta wî de evîna welat, karekterê neteweyî yê Kurdan, welatperwerî û daxwaza rizgariya gelê Kurd, her dem di pêş de bû. Di helbestê de zimanê wî sivik û herikbar e.

■ Bêguman Celadet Bedirxan, bi tenê helbestên bi qafiye nenivîsî; di warê helbesta Kurdî ya hemdem de jî ceribandinên wî çêbûn. Helbesta wî ya bi navê "Bilûra Min" di vî warî de nimûneyek girîng e. Hîmên helbesta Kurdî ya hemdem, em di vê helbesta Celadet Bedirxan a ku serbest nivîsiye de, dibînin.

*Nêrînek li ser hunera neteweyî*

# Huner li welatekî serbixwe digihîje pîvanên cîhanî

**Memoyê Dekşûrî**

Di vî warî de ez dixwazim rohnî û şewqa welêt birêjim ser çend qunciкên reş û tarî, di raman û bir û baweriya neteweyî de. Ku em karibin hunermendên xwe ji nav erênayê derxin.

### HUNER ÇI YE?

Huner, berhema bikaranîna xeyalê ye, vekirina çav e. Honandin û rêsandina bûyer, serpêhatiyan e. Şêweyên hunerî gelek in û rengo rengo ne: Helbest, roman, sînema, nivîsandin, wêje, tinazo, stran... Tê wê wateyê ku huner bêguman kategoriyeke civakî ye. Ku di sergehê de tê hilbirandin. Lê binke û jêderka wê kul, derd, xem, êş, gelşên civakî, etnîkî, olî, êlî û neteweyî ne. Em dikarin bibêjin ku ev naveroka hunera me ye. Ew dil û xwîna ruhê hunerê ne. Bêyî wê hiş winda ye û xeyal qîmeta xwe winda dike. Xeyal dikare bêhtir bûyereke civakî bide qebûlkirinê û bi awayekî pirr bi bandor (tesîr) xelkê me rake ser piyan. Ji bo nimûne: Şewitandina gundekî Kurdistanê, koçberkirina malbateke hêjar, bênan û zad û di nav kincên rizî û qetiyayî de, di bin sermaya zivistanê de, bi hêstir û firmişkên zarokên berpesîr û şîrmijan. Kuştina Kurdekî di zîndanê de, îşkencekirin û destavêtina namûsa keça Kurd di nav lepên xwinmij û firan de, kuştina zarokekî du salî û hwd... Hîn bi hezaran nimûne hene ku tesîra wan di nav miletekî kêmpolîtîkbûyî û hunerhez de ji belavokeke siyasî ya ziwa bêhtir in. Lewma em dikarin bibêjin ku helbestvan, sînemevan, nivîskar, stranbêj û hwd. dikarin bi awayekî hunerî van buyeran tevan pêşkeşî gelê xwe bikin û bi wan gel rake ser lingan. Miletê me bi sirûşta (xwezaya) xwe ve hunermend, stran û helbest hez e.

Diyar e ku hunermend bi rola xwe ya hunerî ji siyasetvanekî ne kêmtir e.

### TEVLÎHEVKIRINA PÎVANA PAŞVEMAYÎNÊ Û BÎREVERIYA SEHT

Çi kar dibe bila bibe mirov û bi taybetî hunermend divê xwedî analîzeke bi bingeh, objektîv û serbest be. Metoda wî, analîzên wî zanistî be.

Pêwist e em bidine xuyan ku divê zîwan û genim cuda bibe û reş û spî ji hev xuya bibe. Li gorî berhevanîna wê, wezinandina wan, emê bikaribin, rastî û çewtiyê ji hev derxînin. Her dem,eşop, roman, û huner, exlaq e.

Em wek gelekî 25 milyonî li ser axa xwe ya parçekirî bênav û ber bi mirina milî ve diçin. Ji me re çi huner divê, an jî divê roja îro serokatiya hunerê çi rengî lê bike? Huner di civaka me de cure cure ye û pirr xemgîne. Hunera neteweyî, ya civakî, ya folklorî, ya evîndarî, sir û pesndarî, jinhezî, bazirganî, înternasyonalî û hwd...

Hunermendên me ku îro tu bi wan mêze dikî, her yek dibêje ez û riya rast a xwe dibînin. Li aliyê din dengê hunera serbixwe û nepolîtîze tê vedan û di ber guhên me de derbas dibin.

Çend rûçikên ku li Ewrûpayê derketine û ji dayîka xwe bûne, ji ber nakokiyên cur be cur di encama pêşketina teknîkê de û di bilindbûna bajarvanî û zanyariya mirov de bûne.

### HUNERA SERBIXWE YAN YA SERXEBÛNÊ

Bi rastî di civaka me Kurdan de, pirr tiştên aloz hatine damezirandin û bûne vîrûsên bêçare, di xwîna me de digevizin. Hemû endamê bedena me post, hestî, mejiyê me, gemarî û bireweriya me seht dike.

Gotina "Serbixwe" di nav zana û ronakbîrê Kurdan de, di nav van deh salên dawî de pirr deng ve daye. Ev yek ji pirrbûna komele, malbat û eşirên kêmsiyaset, sextekirina siyaseta rast û nezayîn û damezirandina siyaseta neteweyî tê. Siyaseta serbixwebûna welêt, weke di dema hilweşandina împaratoriya Osmanî de gava Ereb, neteweyên Balkanî îdeolojiyên neteweyî çêkirin û dewletên xwe li dar xistin maneya siyaseta rast cuda kirin û wek bîreweriya herêmparêzî, eşirperestî, olperestî, partîgirtini û hwd... bi kar anîn.

Ev sebeb pirr serekî ne ku hişt çend nîv–zanayên me ji rastiya welêt dûr bikevin û berê xwe jê biguherin.

Em problemeke seyr belû dikin. Divê ev li cem tu dewletan nebe, an jî wexta ku hebe jî pirr jar e. Girêdana hunerê bi polîtîkaya neteweyî ve, dema em li derdora xwe dinêrin dibînin ku di dewleteкê de huner (helbest, stran, sînema, nivîskarî, wêje) di cîhana xwe siyasetî de dîwarekî hesinî heye.

Gelo ev yek çiqas dikare li welatê me yi parçekirî û dagirkirî hebe? Li welatê me dagirkerên me ji bo parastina dewleta xwe, ji bo binaxkirina çanda me û dizî û talankirina nirxên me, ji yên însanî bigire ta yên neteweyî, ji çepgirên wan ta bi rastgirên wan, ji polîtîkvanên wan heya bi hunermend û sosyalîtan, li ser her tiştî distrên, helbestan dihonin, filman çêdikin, roman dinivîsin û zanistiyê neteweyî dikin.

Ew bi şanazî li vê yekê û bi çavekî biçûk jî li me dinêrin. Em dixwazin vê yekê bibêjin. Heya kengê wê hunermend bibin dev û çavên netewe û siyaseta xwe. Erê hunermend û rewşenbîr heta radeyekê wê serbixwe be, lê zirarê li yekîtiya neteweyî neke. Lê tiştekî giring me ji bîr kiriye, dema welat dameziriya, ne hewce ye ku hunermend siyaseta dewletê bimeşîne û romannivîs yekê li ser parastina sinorê dewletê binivîse, di ser de ku di dewletên dagirkerî de ev yek hene jî.

Divê neyê jibirkirin ku em di gemiyekê de ne û qalkirin û kunkirina wê derd e. Li aliyê din em bêdewlet in û welatê me ji avabûna dewleteкê re avis e.

Ji bo me hunera neteweyî ya serxwebûn û azadiyê pêwist e. Hunermend û siyasetvanên me îro di gemiyekê de ne û çarenûsa wan yek e. Dijminê me ne hunermendan nas dike û ne jî siyasetvanan. Tenê tiştek, Kurdîtî jêre derd û xem e. Îro hunermend û niviskar bi resenê xwe Kurd in, lê ne Kurdperwer in.

Tu azadî û mafên hunermandan di welatê me de ji yên xelkê besit ne bêhtir e. Tehde û îşkence li ser hunerê jî dibe, bigotineke din em bêhuner dibin an jî hunera me hîç û pûç dibe, li ber gelên dagirkeriya huneriyê. Lewma divê ne hunermend û pêşmerge, ne jî nivîskar, stranbêj û zanyar jî, ji hev cuda nebin. Hemû ji rengên hebûna me ne û riyên cur be cur li pêşiya wan in.

Di riya rizgarkirina welêt de pêşmergeyê tiving di mil de, stranbêj bi tenbûra xwe û nivîskar bi nivîs û qelema xwe di cepheyekê de ne.

Di vir de em dibînin xebat û têkoşîn ji bo avakirina dewletê karê her kesî ye. Û divê her kes li gorî kategoriya xwe, zanistiya xwe avê berde ser aşê neteweyî. Huner tenê dikare di nav welateke serbixwe û azad de bigihe radeyeke bilind û pivanên cîhaniyê.

### ENCAM

Hunera neteweyî û serxwebûnî ji me re divê. Hunera ku divê, ne kêmî fişekeke pêşmergeyekî be. Bi tenê em dikarin hunereke dilawer û bi posîde (tesîr) eniyeke bilind vekin, li hemberî dijmin. Xebata hunerî divê di eniya neteweyî de bibe şaxekî mezin. Bila helbest, stran, roman bibin tanq, fişek li dijî dagirkeriyê hunerî ku ji aliyê xwinmijan ve tê birêxistin.

Divê xweş agah bin ku eniya hunerî nabe alternatîf ji eniya neteweyî re, an jî hunermend nabe cigirê siyasetvan û pêşmerge. Weke hunera burjuvazî, aristokrat û bêhelwestî.

Huner laş û gewdeyeke; hunermend dev, çav û guhê wê ne, siyaset û pêşmerge dest, ling û mejiyên wê ne.



*Di têkoşîna neteweyî, civakî û çinî de rola hunerê bêgengeşî baş tê qebûlkirin. Di wêneyê Koma Botan di şeva YJWK'ê ya Hannoverê de tê dîtin.*



*Di pêvajoya şoreşê de hunermendên dahatuyê jî tên gihandin. Di şeva YJWK'ê ya Hannoverê de keçikeke Kurd.*

# Ketîniya Kurdan dîrokî ye!



Gavan Koçer

Îro, em li ser dinê gelekî wek gelê Kurd ketî û belavbûyî nabînin. Ji xeynî me kê welatê xwe li cih hiştiye û ketiye derû doran, parsê dike? Li Tirkiyê, welatên Ereban, Farisan, Ewrûpiyan çi karên bêrûmet hene, em Kurd dikin. Ew kar ên ku me li welatê xwe nedikir. Çima gelê Kurd ji gelên din re bûye kole? Çima em, ji nîjadperestên Tirkan pirrtir bûne Tirk, ji yê Ereban pirrtir bûne Ereb? Çima "ronakbîrên" me ji hebûna xwe fedî dikin? Pirraniya "ronakbîrên me" bûne Tirk, ew ji Tirkan zêdetir ji bo Tirkitiyê qêrîne û diqîrin. Ew, ji bo înkarkirina Kurdayetiyê zagonan çêdikin û çêkirine. Ew, dixwazin xwe bikin endamê neteweyeke ku di nav civaka dinê de pê re qedr û qîmetek tune û bi navê dirindetiyê hatiye naskirin. Yên ku dibêjin em Kurd in, ew jî dixwazin Kurdatiyê bifiroşin. Xwefiroşî, çima di nav me de bûye adetek? Çima em bi dijminan re bi dilovaniyê şer dikin, lê em ji bo welatekî serbixwe, xwe ji şer dûr digirin? Kê bi 30 milyon mirovan welatekî serbixwe çênekiriye? Em çima ji xwe re ejderiya ne, lê li ber dijmin dibin pisîkên kûvî, mirîşkên melisî? Gelo behîta (mucîze) vê çi ye?

Kurdan, di dîroka xwe de pirraniya jiyana xwe ji bo xizmeta biyaniyan derbas kirine. Va ye, di dîroka Kurdan de tiştekî vekirî ye, ku dema welatê Kurdan hatiyedagirkirin, di nav Kurdan de ew tayfeyên ku li hemberên hevdu bûne, ji wan yek bi dilxwazî çûye aliyê ew biyaniyan ku êriş anîne li ser wan.

Di dîroka Kurdistanê de bi hezaran mînakên wiha hene: Di 1514'an de hevxebatkariya Hakim Îdrîsî Bedlîsî bi Yavuz S. Selîm re, di 1925'ê de xwesipariya Qaso û hwd, di 1937'ê de xwesparî ya Rayber, nû hevxebatkariya kevneperastên Mesûd û Celal û Şerafettîn Elçî li hemberî têkoşîna rizgarîxwaz bi rejîma sitemkar (Tirk) ve. "Mesûdê me, Şerafedînê me û hwd." ji me çi dixwazin?

Em, li vir pirsan bibirrin û li gor hêza xwe li bersivan bigerin.

**HISÊN NETEWEYÎ**

Di dîroka mirovahiyê de hisên neteweyî ciheke giranbuha girtine. Netewe bi wan li ser lingan sekinîne. Pêkhatina hisên neteweyî, girêdayiyê damezrandina civatekî sazûmanî ye.

Civat, ji bo erdimekê awênekirî (kişfkirî) bi çandeke rast û dezgehên bingehî yên ku sîstemekê dikin xwediyê rûmetê, tê gotin avahiyekî ye. Di civateke birêzî de kes, jin, mêr, tayfe bi kurtî hemû

> *Di 1514'ê de hevxebatkariya Hakim Îdrîsî Bedlîsî bi Yavuz S. Selîm re, di 1925'ê de xwesipariya Qaso û hwd, di 1937'ê de xwesparî ya Rayber, nû hevxebatkariya kevneperastên Mesûd û Celal û Şerafettîn Elçî li hembera têkoşîna rizgarîxwaz bi rejîma sitemkar (Tirk) ve. "Mesûdê me, Şerafedînê me û hwd." ji me çi dixwazin?*

endamên vê civatê, sazûmanên xwe çêdikin û li gor qeweta xwe erkên xwe bi cih tînin, da ku bi vî awayî sîstema civake bi rê ve bibin. Di avahiyên civakî de kevneşop û nirxên nû di hundirê çandeke hevpar ya neteweyî de dikevin holê, cîhekî giranbuha digirin. Pêşveçûna van nirxan gav bi gav rengên neteweyî zeximtir dikin.

Di civatekê de vî karî, dezgehên zanistiyê digirin li ser xwe. Beşdarbûnên konevanî, aborî û çandî bingehên biryarên neteweyî pêk tînin. Pêşveçûneke wiha di civatê de kesîtiyeke hevpar pêk tîne û ev dibin encama ji holê rakirina dubendiyên şexsîtî.

Fiza (hurûr ye) neteweyî bilind dibe û rûmeteke mezin digire. Gelê vê civatê bi dilxwaziya welatê xwe li dijî hêzên sitemkaran dipareze.

Kurdan, hîn welatekî azad, zimanekî paqij, fîzayeke neteweyî pêk neanîne, ji ber ku welatê Kurdan, welatekî dagirkirî û belavbûyî ye. Lewma, civata Kurdan, civateke ne sazkirî ye.

Gelo di civateke dagirkirî de hisên neteweyî çawan e?

Frantz Fanon di pirtûka xwe ya "Çermê reş û maskeyên spî (1952)" de taybetiyên civateke dagirkirî wiha rêz dike:

"a. Çînya karbidest (li Kurdistanê, dadger, dozger (savci), walî, qeymeqam û karmendên dewletê yên din) ji dagirkeran pêk tê.

b. Şêweya jiyanê, ziman, çand û hwd. yên çînya karbidest navekî (hil) dide û dibe prototîpek (orjînal). Gelê welatê dagirkirî dest pê dike, bi çavekî nizim li xwe mêze dike.

c. Çanda zikmakî hêdî hêdî tê jibîrkirin. Bêrûmetî û sernewqî (adîtî) belav dibe û heyîniya neteweyî tê redandin (redkirin).

d. Lê cardin jî, pirsgirêkên huwiyetê gişt ji holê ranabin. Ji ber ku hêj (hîn) di navebera çîniya karbidest û gelê bindest de dubendî yên mezin didomin; nîşanên wek têkeliyên kevneşop, telefûzê ziman, xuyabûniya der (fîryonomî) û hwd.

Ew taybetiyên ku Fanon li jor rêz dike encamê helandinê ne.

**HELANDINÎ**

Di domana helandinê de zanyariya kesîtî û yekîtiya neteweyî kêm dibin. Nexasim, ji kêmbûna hisên neteweyî re helandina psîkolojîkî tê gotin, ango hisên kesîtî yên gelê bindest dest pê dikin ji bo civata dagirkeran dişewitin.

Li vir, mirov digihêje mafên xwe yên şexsî, lê ne yên neteweyî. Di vî warî de ramyariyê mêtingeriyê ji holê rakirina neteweyekê ye.

Di dîroka Kurdistanê de hebûna gelê Kurd wek neteweyekê, bi çanda wê nehatiye tqebûl kirin. Bingeha çanda Kurdan hatiye hejandin. Zimanê wan, ku di nav taybetiyên gelêrî de, yê girîngtirîn e, hatiye qedexekirin. Jixwe, dinya giş dizane qedexekirina zimanê xerakirina kesîtiya gelekî ye. Armanca polîtîka dagirkirî, her wext wek kolektîfî hilweşandina Kurdan bûye. Wan bi darê zorê Kurd kirine Tirk, Ereb û Faris.

Di civata Kurdan de di domaneke dirêj de bikaranîna van sitemkariyan di nav gelê Kurd de hisên neteweyî helandine. Lewma, Kurd hebûna xwe înkar dikin û çaxê ku li kêleka Tirkan in naxwazin bi Kurdî biaxivin. Ew, her wext dixwazin Kurdatiya xwe veşêrînin.

Gotinên jorîn rastiyeke zanistî tînên ber çavan. Ew jî ew e; ketiniya (ev bira were zanînê ku xwediyê gotina ketinê Seroke A.ÖCAlAN e Kurdan dîrokî ye û divê sedemên vê jî di dîroka Kurdan de were lêkolîn. Ji bo vê jî, divê dîroka Kurdan ji Gutiyan, Hurtiyan, Mîtaniyan, Medan heya îro gav bi gav were lêkolînkirin. Wê çaxê lêkolîneke zanistî û zelal bi dîtin û nêrînên Kurdan wê rastiyan bêhtir derxîne holê.

## Sazek ji çavê Kurdistan re

Westiyame
Weke dergavanekî
pêlan şikandî
Gemiya wî
Ez dixwazim
Li peravên herdu
çavên te vewestim
Ez di çavên te yên
xemgîn de dibînim
Bi sedan qeykên şikestî
Ez biharên şewitî
Bêjimar tê de dibînim
Bi hezaran
Ez stêrên vemirî tê de
dibînim
Herdu çavên te du
dîwanê evîn in
Ez bi xemgînî dixwînim
Du siwar in
Di riyên dil de li eşqê
digerin
Du Kevok in
Tên di esmanê birînên
min î kûr de difirin
Da ku bêhêsir du çavên
te bibînim
Dê Ararat bihejînim
Dê Avistayê li ber
Dergehên Laleş
bixwînim
Li newalê
Bi Siyabend re binalim
Bi Memo re
Dê li ser Bozê Rewan
Çav li Botan bigerînim
Kevirên bêstûn
bi Ferhad re binalim
Dê bi cotkaran re cot
bikim
Herime zozanan di gel
wan koçeran
Têkevim govend û dîlan
û semayan
Bistrêm
Dê bi şervanan re
navê te li ser
Reşzinaran binivîsim
Ji rehên dil
Ji te re tacê birêsim
Ta ku çavên te bibînim
Wek du dîwanê evînê
Pel bi pel wan bixwînim
Dê bi pêlan re,
bi bahozan re şer kim
Bi du destên xwe yên
tazî
Ar bilind kim
Bo di tarîka şevê de
Herdu çavên te bibînim

Pirr hene
Doza eşqa herdu
çavên te dikin
Jê re helbestan dixwînin
Lê wekî min
Aşiqê çavê te nîn in.

**JAN DOST**

# Werin em sala 1994'an bikin saleke Kurdî

**Dr. Poloço**



Erê, werin em sala 1994'an bikin saleke Kurdî. Em xewna sedsalan li rastiyê bigerînin. Em mîna çiyayekî bilind ber li pêla asîmilasiyonê bigirin. Em bi Kurdî razên, bi Kurdî rabin. Em bi Kurdî tevbigerin. Em navên Kurdî li zarokên xwe bikin, bi wan re bi Kurdî bipeyivin. Sohbetên xwe bi Kurdî bikin, civîn û semînerên xwe bi Kurdî... Weşanên bi Kurdî yên ku hene bixwînin, yên ku ne bi Kurdî ne bikin bi Kurdî. Em weşanxaneyên mezin ava bikin, bi jinûve çapkirina klasîkan bigire heta folklorê... Ji helbest, çîrok, roman, piyes û lêkolînên nivîskarên me yên niha bigirin, heta wergerandina klasîk û berhemên din yên cîhanê. Em piştgiriya enstîtu, wexif û hemû sazgehên din ên demokratîk bikin, wan aktîv û bi ber bikin. Em ji bo teşwîqa nivîsandin û nivîskariyê xelatan belav bikin, musabeqeyan çêbikin, şevên xwendina helbestan û festîvalên edebî li dar bixin. Grûbên tiyatroyê yên profesyonel ava bikin, lîstikên Kurdî bileyizin. Di şevên çandî, konser û dawetên Kurdî de bi Kurdî bistirên, bi Kurdî bipeyivin. Di nava gel de bi Kurdî propagandayê bikin. Li polîsxane û mehkemeyan bi Kurdî îfadeyên xwe bidin. Di hevpeyvînên radyo, rojname û televizyonan de bi Kurdî bipeyivin. Bi hevdudîtinên heyetên derve re ger em bi zimanê wan nizanibin, em her tim bi Kurdî bipeyivin, wergêran bixwazin. Nemaze bi hevpeyvînên radyo û televizyonên derve re bi Kurdî bipeyivin.

Li belediyên ku di destên me de ne, heta ji me bê em navên şaîr, nivîskar, alim, zana û şehîdên Kurdistanê li kuçe, kolan, par û dibistanan bikin.

Werin em sala 94'an bikin saleke Kurdî. Qet nebe hema îsal... Em ji kesî kanalên televizyonan naxwazin, em bi xwe gava xwe biavêjin, kadroyên xwe bi xwe bigihînin, îmkanên xwe seferber bikin, ji xwe re kanalên xwe bi xwe vekin, li hundir nebû, em li derve bikin bi riyên satelîtan em xwe bigihînin hemû malên Kurdan. Em nûçeyan bi Kurdî sohbetên çandî bi Kurdî, stranan bi Kurdî bibihîzin. Em çend radyoyan vekin, li hundir nebû li derve, bi pêlên dengên xweş û zîz li awaz û dengê Kurdî guhdarî bikin. Em bi hemû hêza xwe li ser derxistina rojnameyeke rojane rawestin, bibin yek, wê derxin.

Çi dibe, hema îsal... tenê îsal em vê bikin. Karkerino, gundîno, siyasetvanino, rewşenbîrino, dewlemendino, mirovên bi rûmet, em bi hev re ji bo vê doza xwe ya pîroz bilivin. Ev tenê mafekî me yê tebiî ye. Îro, li ser rûyê cîhanê, çi gelên serdest, çi jî yên bindest, hemû xwediyên van mafan in. Bawer bikin, em tenê jê bêpar in. Em tenê jê bêpar hatine hiştin. Ev xwesteka me ne li dijî menfeeta tu gel û miletan e. Em bi dengê bilind li dijî her celeb sîtemkariya ku li ser rûyê cîhanê heye, bang dikin, lê çi dibe, em mafên xwe yên bingehîn ji bîr nekin.

Werin xwişk û birano, werin, em sala 94'an bikin saleke Kurdî!...



## Ji bo Îsmaîl Beşikçî

Darekê got:
"Em niha nikarin
Cadeyeke Diyarbekirê
Bi navê te binavînin..
Kûlîlkekê got:
"Em niha nikarin
baxçeyekê li nav
Qamişlî
Bi navê te binavînin."
Helbestekê got:
"Em niha nikarin
Pirtûkxaneyeke
Sablaxê*
Bi navê te binavînin.
Kevirekî got:
"Em niha nikarin
Peykerekî ji bo te
li ser sînga
Babegurgurê**
Çêbikin
Di dawiyê de
Kurdistanê got:
Ew tiştê ku em niha
Dikarin bikin, ewe
Wekea gûl û şiîr û
azadiyê
Di giyana xwe de
vedişêrin

* Navê Mihabadê ye
** Navê Kerkûkê ye

***Şêrko Bêkes***

*Werger ji Kurmanciya jêrîn:* ***Pismam***

# 'Nerastiya kovara Rastiyê'

S. Berbang

*Mînak tesbît ev in, "PKK nikare vî karî bibe serî, mitleq wê bi împeryalîzmê re li hev bike, ji ber ku ew tevgereke neteweperest e, nikare nûneriya karker û gundiyên kedkar bike. Li ser rûyê erdê Tirkiyeyê tenê yek rêxistinek ML heye, bêpêşengiya vê partiyê rewşa gel wê her tim perîşan bibe, gel nikare bigihîje sosyalîzmê û gelê Kurd jî divê li hêviya wê be, heke pêwist be, heta heta. Wek filehên ku li hêviya Mesîh in, wek mirovên li hêviya Gogol.*

Di nav folklora gelê me de çîrokek heye li ser rovî û kerê ye, di dereke çîrokê de rovî ji jina xwe re dibêje: "Ser bi mastê gotinên, bav û bapîrên te hemû rast in." Lê dema dikeve dafikê, îca dibêje: "Ser bi dewê, gotinên bav û bapîrên te giş derew in." Ez bawer dikim wê xwendevanên Kovara Gerçek'ê ji nivîskarên wê re gotina duyemîn bibêjin.

Gerçek ango Rastî navê kovareke hefteyî ya çepgirên Tirkan e, ev demeke dirêj e ku, li ser navê "tûjbûnê" nivîsarên ecêp li ser Kurdan û Kurdistanê, bi taybetî jî li ser Tevgera Azadiyê diweşîne.

Nivîsara vê hefteyê (8–14'ê Rêbendanê) ya li ser Kurdistanê, li ser rewşa fêrgehên li Kurdistanê û qedexeya PKK'ê ya li ser fêrgehan e. Ev zilam li ser navê dostaniyê rexne li vê polîtîkayê digirin, lê çi rexne, rexneyên wisa bifîlitî û ji giyana şer dûr ku, mirov dikeve ecêbê. Ev heval li ser navê nûçegihaniyê raste rast nabêjin, bi xelkê didin gotin, di serî de hinek tesbîtên marksîst hene û li gorî wan, van teoriyên asîmanî, gel didin peyivîn. Mînak tesbît ev in, "PKK nikare vî karî bibe serî, mitleq wê bi împeryalîzmê re li hev bike, ji ber ku ew tevgereke neteweperest e, nikare nûneriya karker û gundiyên kedkar bike. Li ser rûyê erda Tirkiyeyê tenê yek rêxistinek ML heye, bêpêşengiya vê partiyê rewşa gel wê her tim perîşan bibe, gel nikare bigihîje sosyalîzmê û gelê Kurd jî divê li hêviya wê be. Heke pêwist be, heta heta. Wek filehên ku li hêviya Mesîh in, wek mirovên li heviya Gogol. Niha em bên ser mijara xwe, ev kovar dibêje: "Gel naxwaze dev ji dibistanan berde, PKK bi darê zorê, bi mirovan dide berdan, zirara vê yekê jî digihîje mirovên xizan, kesên dewlemend jixwe diçin metropolan ango rojavayê Tirkiyeyê." Lê ev malikwêran tênagihîjin ku gel, li wir şerê hebûn û nebûnê dide, dijmin bi hemû dezgehê xwe (yên sivîl jî tê de) şerê giştî dimeşînin. Di rewşek wiha, li welatekî dagirkirî, xwendin ji aliyê dewletê ve, bi armancekê tê bikaranîn, dewlet bi her azîneyî hewl dide xwe ku qirkirineke giştî pêk bîne, li xwendegehan jî rê li ber hemû pêşveçûyinên demokratîk û pêşverû digire, di demeke wiha de ji bo gel û nemaze jî, ji bo mirovên ciwan, berxwedaneke giştî divê. Ku mirov li aliyekî bibêje "PKK bi dewletê re li hev tê, dev jî şerê çekdarî berdide", aliyê din bibe berdevkê çend mirovên ku ji şer û berxwedanê direvin, ez bawer dikim, qasî nûnerên şerê taybetî tevgera azadiyê dinasîne, ne jî gelê Kurd. Wezîrê dewletê bi hejmaran nîşan dide ku, livbaziyên PKK'ê di 1993'yan de hilperikîne, hemû nivîskarên burjûva, di vê baweriyê de ne, êdî dema diçin Papuxa Gîneya Nû jî, li dijî PKK'ê piştgiriyê dixwazin, nivîskarên vê kovarê, hîn xewna pêşengiya gelê Kurd dibînin, li yekîtiyeke ku "pêdiviya gelê Kurd ji bo pêşengiyê çareser bike" digerin. Heke fedî nekin wê biçin tîmên ku dibêjin; "Em ji bo nên vî karî dikin" jî derxin ser rûpelên xwe, wê vê yekê jî li ser navê çînayetiyê bikin. Çend hefte berî vê nivîsarek li ser Edeneyê derket, bi rastî jî, tiştên wisa nivîsandibûn ku, hema hema piçek mabû ku, bigihîje vê radeyê, wek ku, haya wan ji zagonên şoreşê nîn be, çûbûn mirovên ku dibêjin, "Em ji bo nanê xwe eraqê difroşin" dîtibûn, dadixuyandin ku "gel êdî ji kirinên PKK'ê aciz bûye". Ev nabêjin: "Me ji bo pêkanîna biratiya gelan (Kurd, Tirk û Ereban) çi kiriye?" Ji bo betalkirina hewldanên serdestan çi kiriye? Di ser vê van gişkan de, pêşdaraziyên di navbera gelan de tundtir dikin, li ser navê şoreşgeriyê. Bi xwe jî dizanin, berpirsiyarê her cure sûcî dewletê têkiliyên rêveberên dewletê bi rexistinên herifî re heye û wan rêxistinan ji bo xistina mirovên me bi kar tîne, li kolanên metropolan, bi mirovên ketî her celeb karê pîs dide kirin, pişt re wan wek kontra bi kar tîne, lê dîsa dibêjin, qedexekirina van tiştan ne rast e. Bi rastî jî qet bîna dostaniyê û şoreşvaniyê ji wan nivîsaran nayê, zêdetir rengê mirovên ji şer dûr û reformîst lê dikeve.


Ev herdu nivîsarên ku min wek mînak hildan, li gorî dîtina min yên herî balkêş bûn. Xeynî wan çend nivîsarên din jî hebûn min pêwist nedît li ser rawestim. Yek ji wan li ser kontrayekî li Mêrsînê bû; li wir jî dev diavêjin PKK'ê û bûyerê rast şîrove nakin. Nexwe pêwist nîn e, em helwesta wan ya der heqê bûyera Xozadê de şîrove bikin, ew mijara bingehîn ya vê kovarê ye ku heta ev hebin vê bidome. Heke ev mirov ji aliyê dewletê ve hatibûna kuştin, ez bawer nakim ku ewqas ew li ser rawestiyana, li ser seneryoyên ku dişibin fîlmên Hollywoodê yên li ser şerê Vîetnamê û ji xwe re bikirana rawestgeha şev û rojê. Tiştekî din ku ez dixwazim bibêjim jî ev e, ez niha vê nivîsarê dinivîsim, lê ez bi şik û guman im, ji aliyekî ve jî xemgîn im, ji ber ku ez bawer nakim ku kes ji wan, karibe bixwîne û (dibê ku karibin bi zor û zehmetî bixwînin) bi Kurdî bibersivîne heke ew tişt pêk were ezê şanaz bibim, ji ber ku "Nûnerên karkerên hemû Tirkiyeyê" mijûlbûna bi Kurdî, wek luksekê dinirxînin, dibêjin, "Mirovên ku ji bo sosyalîzmê mijûl dibin, bi karê wiha biçûk mijûl nabin." Wek tê zanîn, di Marşa Karkerên Avustûryayê de jî tê gotin ku, "Ziman yek e ji bo me. Dîn yek e ji bo me." Ez bawer dikim ku sosyalîzmek e ewqas kozmopolît, dibe ku li asîman ava bibe, lê li ser erdê qet çênabe, ji ber ku li ser rûyê zemîn, welat, netewe û hwd. hene, wê heta demeke dirêj jî hebin ev yek.

A din heta gelê li ser erdê KT'ê, heta bi giştî bi xwe nehesin, nasnavê xwe nedin pejirandin, li ser bingeha pişaftinê, pergaleke weke sosyalîzmê; pergala bi ser xwe hatina hemû mirovên ku bi sed salan kesayetiya wan, nasnavê wan hatiye perçiqandin, bi wan hatiye lîstin, nayê pê. Wê ew pergal li ser bingeheke nû û bi destê mirovên ji her alî ve azad û serbilind ava bibe, ne bi mirovên ketî û şikestî. Beredayî Hozan N. Hîkmet nav lê nekiriye: "Wek darekê bi serê xwe û azad, wek danistanekê bi biratî". Hozan dibêje: "Weke darekê bi serê xwe û azad/ Wek daristanekê bi biratî.

Ji lew re rêxistinên bi rengê berê (ji kevneşopa M. Kemal) êdî ne tenê pêşengiya kedkarên Kurd (jixwe ev qonaxa derbas bû) nikarin bi vê hizrê, pêşengiya gelê Tirk, Ereb, Çerkez, Laz û hwd. jî bikin.

## XAÇEPIRS

**Amadekar: Rasto Zîlanî**



**Çeperast:** 1–Di wêne de tê dîtin. Şanogerekî Fransî ye û di sedsala 18. de jiyaye. Piştî Racîne, Corneille û Molière ew şanogerê herî navdar ê Fransayê ye. Navên çend berhemên wî: Lîstika Evîn û Rasthatinê, Civîna Evînan, Serfiraziya Evînê, Jiyana Marîannayê/ Piştî ku ji fêkî av tê vekişandin tiştê ji ber dimîne 2–Dîn/ Paytexta Yewnanîstanê 3–Qewimîn, çêbûn, pêkhatin 4–Îşaret/ Rengdêra peyva "rûmet" 5–Şêwe, terz/ Bi Erebî "ez"/ Cînavka yekemîn a yekehejmar 6–Qefle, grûb/ Navê kenînê 7–Awayekî banga hawarê/ Du tîpên bêdeng 8–Navê lîstikeke kompîturê 9–Agir/ Ji ber êşê agirê ku dikeve laşê mirov/ Jân 10–Anîn zimên.

**Serejêr:** 1–Şanogerekî Fransî ku yek ji yên herî navdar e û di sedsala 17. de jiyaye. "Nexweşê nexweşiyan, Çikûs, Tartuffe" çend berhemên wî ne./ Ji bo vexwarinê madeya bingehîn e. 2–Kesê bi zanistê re mijûl dibe/ Şop, rêç 3–Felaket 4–Bi Îngilîzî kurtnivîsa Pakta Atlantîkê ya Bakur 5–Derewkar/ Westa, betilî 6–Cephe, bere 7–Navê gundekî li herêma Xerzan ku li ser navçeya Misircê ye. Dewleta Tirk navê wî daniye Beşpinar/ Yên 8–Xanim/ Kar, şixul 9–Kesê ku dil nade pereyan xerc bike 10–Kincikê ku mirov li potên qetiyayî û qul dixe û pê ve didirû 11–Yan/ Cînavka duyemîn a yekehejmar 12–Demsalek

**BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇÛYÎ**

**Çeperast:** 1–Bekîr Yildiz 2–Art/ Te/ Îm/ An 3–Bê/ Bakur/ Îro 4–Encam/ Esît 5–Lîr/ Heywan 6–Er 7–Stranbêj 8–Kî/ Dia 9–Ko/ An 10–Kalîgula

**Serejêr:** 1–Babelîsk 2–Erênî/ Tîka 3–KT/ Cr/ Ol 4–Ba/ Ad 5–Rtam/ Ning 6–Yek/ Heba 7–Erê/ Al 8–Lîr/ Jana 9–DM/ Ew 10–Îsa 11–Zarîn 12–Not


## KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ...... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

**Bedelê abonetiyê razînin:**

**Li derve:** Mazhar Günbat
İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095
Döviz tevdiat Hesap No: 3138437

**Li Tirkiyê:** Mazhar Günbat
İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095
Hesap No: 0408342

Ji kerema xwe re cihên li jor vala dagirin û tevî kopiyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînin.

**Navnîşana Welat:** Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul
Tel: 513 34 33 Fax (Tel): 511 50 07

**Mercên abonetiyê:**

| | Li hundir | Li derve |
|---|---|---|
| 3 meh | 120.000 | 50 DM |
| 6 meh | 240.000 | 100 DM |
| 12 meh | 480.000 | 200 DM |

# Tinazok û pêkenokên zarokan

**1) KURIKO**
Kuriko ser kundiro
Diya te savar çêkiro
Rûn tune bû
Av lê kiro

Di navbera zarokên Kurdan de, dema yekî biyanî tê gundê wan bi zarokan wiha tinazan dikin.



**2) GIRÎ–GIRÎ**
Girî girî
Hebek tirî
Tu digirî
Li ser hebek tirî

Ev gotin jî zarok ji hev re dibêjin, ji bo ku girîna hev binin.



**3) QEVD Û QESEL**
Qevd û Qesel
Biniya menzel
Mûkî min
Hezar yê te

Di gengeşiyên zarokan de. Zarok wek gotinên xerab dibersivînin û bi hezar car pirrtir vedigerînin ji yê/a din re.



**4) KURÊ KERÊ**
Kurê kerê
Ser bênderê
Ka dixwe
Nade kerê

Zarokên kurik dema diçin nav keçikan dileyîzin, keçik, kurikan li nav xwe napejirînin û wan ji nav xwe diajon. Dema diajon jî wiha dibêjin: Kurê kerê.



**5) HO–HO**
Ku ho–ho bûya yî
Tu dê li devê deriyê
Bavo bûya yî

Vê gotinê: Mezin ji zarokan re dibêjin. Wateya gotinê ji ev e ku; Ku tu bi kêrî tiştekî bihatayî, tu dê ji bavê re bixebitiyayî.



**6) PIRPIZÊ (K)**
Pirpizê karan dikizê
Yek a min
Yek a Hemzê
A Hemzê ket çalê
A min ma dotira salê

Strana keçikan e ev. Biharan keçik ber bi çolê ve diçin. Di destpêka biharê de pirpizêk çêdibin, bi dîtina pirpizêkan re keçik desť bi strana Pirpizê dikin.




**7) PÎSIKO**
Pîsiko, serholîko
Poz mocrolîko
Bêbil lîko
Dev qîçko
Rû gemarîko

Strana çepeliyê ye. Ji zarokên çepel re tê gotin ji bo ku xwe pak û paqij bigirin.



**8) CIVO–CIVO**
Civo civo dev reqis
Nadim te nanê garis
Hetanî tu bikî tir û fis


Zarokên Kurd tev sewalperwer in. Dema cewrikek, karikek, berxikek, çîçikek yan jî çivîkekê wan heybe pê şah dibin. Yê çivîkê taybetiyek heye. Ji çivîkê re wiha dibêjin.



*Dr. Cemşîd Heyderî (Rojnamevan û Mamosteyê Zanistgehê) ji bo Welat peyivî:*

# Çand li ber lehiya serhildanê çû

■ Herçiqas piştî sala 1975 edeb û çand roleke girîng di jiyana civakî û siyasî ya gelê Kurd de leyistibe jî, îro piştî serhildana 9' î hêjayiyeke me tune ku em şanaz û serbilnd bibin. Li başûrê Kurdistanê azadiya rojnamevanî nîn e û mafên mirovan tê binpêkirin. Gelek bûyerên terorî qewîmîn û rojnamevan venekolan.



**Dr. CEMŞÎD HEYDERÎ;** *di sala 1939' an de li bajarê Hewlêrê ji dayika xwe dibe. Xwendina xwe ya sereteyî, navendî û amadehî (lîse) li Hewlêr û Bexdayê diqedîne. Dr. Cemşîd Heyderî xwendina unîversîte û doxtoriya xwe li bajarê Lenîngradê li Sovyetê kuta kiriye. Wî doxtoriya xwe li ser "Çîroka Kurdî" û li Enstîtûya Rojhilatnasiyê ya Akademiya Zanistiya Sovyetî kiriye. Di navbera salên 1970–1983 li Sovyetê, ji 1983 yan heta 1993 an jî li Swêdê jiyaye. Di berpirsiyariya kovarên, Hîma, Berbang, Çuwarçira û Serdemîniwê de hevpar bûye. Yek ji endamê komîteya damezrandina Yekîtiya Nivîskarên Kurd e li Swêdê. Dr. Cemşîd Heyderî di sala 1993 yan de vegeriya Kurdistana Başûr û niha di Unîversîteya Selahaddîn de dersên Edebiyata Kurdî dide.*

**Rûken Baxdû**
**Bedran Hebîb**

*Dr. Cemşîd Heyderî di roja 12'ê Rêbendana 1993'yan de riya xwe bi rojnameya me xist. Bi vê abûbê li ser rewşa çandî û xebatên rojnamegeriyê dîtin û agahiyên xwe anîn zimên. Bi vê fersendê me pê re ji bo agahiya xwendevanên xwe hev peyivînek pêk anî.*

Berî serhildana 91'an hemû dezgehên çandî di bin destê rejîma Beas de bûn. Nivîskarên welatparêz û xwedî helwest nikaribûn di jiyana çandî de hevpariyek raste rast pêk bînin û di bin sansûreke mezin de bûn. Piştî raperînê wisa dihat hêvîkirin ku wê di warê çandî de gavên pirr mezin bên avêtin, berhemên girabuha bên weşandin û bigihîjin destê gel. Lê mixabin ev hêvî ji ber gelek sedemên cur be cur pêk nehat Nebûna alîkariya Hikûmeta Kurdistanê ji aliyê çandî ve bi nivîskaran re, tengasiya weşandin û belavkirinê ji ber rewşa aborî nivîskaran ku dibû astengek, ji bo weşandina berhemên çandî bes rojname mane...

Piştî Serhildanê Yekîtiya Nivîskarên Kurd, kongreya xwe li Başûr danî. Lê sê sal in ev yekîtî di warê çandî de roleke girîng neleyîstiye. Kovara **Nûserî Kurd** heta niha du hejmar jî belav bûye, ew jî çi tenê ji aliyê naverokê û çi jî ji aliyê fam ve ne bi kalîte bûye. Wezareta çandî kovarekê û rojnameyekê derdixe, lê belê ew jî bêkalîte ne.

Li aliyê din nivîskarên Kurd di jiyana xwe ya tabetî de ji ber astengiyên aborî bi afirandinê re nagihîjin û kes ji wan nikare berhemeke xwe bi serê xwe biweşîne.

Weşana rojnameyên Hikûmeta Kurdistanê bi mehane rawestiye. Kanala televiziyona wê jî mêvandarê kanalên partiyên serbixwe ne. PDK û YNK her yek ji wan bi serê xwe xwedî kanalên televiziyon, rojname û kovarên rojane, hefteyî û mehane ne lê ji bo dezgehên ragihandinê yên hikûmetê– ev hikûmeta ku ew pêkanîne bi tu awayî alîkariya wan nagihîje wê. Niha li Başûr pênc kanalên televizyonê û ewqas jî stasyonên radyoyan di weşanê de ne, lê hemû di destê partiyên serbixwe de ne, mirov dikare bibêje ku programên çandî û civakî di van kanalan de gelek kêm in ku ev televîzyon bûne bingeh ji propagandaya berhemên çanda film, muzîk, teatr û hwd. – Tirkî, Farisî û Erebî ya bêsewiye re.

Li Silêmanî pêşkêşkirina berhemên şanogerî hene, lê ev yek ji bo bajarê Hewlêr mirov bi hêsanî nikare bibêje. Xeynî vî jixwe mirov bi zik û berîkên vala bi kêrî çûna şanoyê jî nayê!

### AZADIYA ROJNAMEGERIYÊ NÎN E

Li başûrê Kurdistanê hejmara rojnameyan û kovaran gelek in, bes her yek ji wan bi serê xwe organên partiyeke siyasî ne. Rojnameyek bi serê xwe tune ye. Lewre rojnamevanên serbixwe bêderfet in, ji bo agahiya problemên gel û kêmasiyên rewşê. Sendîkaya rojnamevanan hê li Başûr ava nebûye. Rojnamevan bi hêsanî karin ji aliyê berpirsiyarên rojnameyan ve bên qewirandin û tu cihekî wan î ji bo ku li mafê xwe xwedî derkevin serî lê bidin nîn e. Li ser qanûn, mafê îfadekirina rojnamegeriyê heye lê birêvebirina wê ya di jiyanê de tune. Mînak, Rojnameya **Welat** hate girtin û mor li deriyê wê dan, lê li hember vê, wezareta Çandê ku di vî warî de rayedar e tu gaveke pêwist neavêt. Tenê rojnameya **Alaya Azadî** û **Rizgarî** bi çend gotaran piştgiriya xwe ya bi rojnemeya Welat re anîn zimên.

Tiştê balkêş ew e ku rojnamevanên rojnameyên partiyan gelek caran nivîsên xwe yên ku li gor siyaseta partiyan di rojnameyên wan de nikarin bên weşandin ji rojnameyên din re dişînin. Bi taybetî jî ji bo rojnameya Alaya Azadî ku heta radeyekê di warê îfaderinê de azad e.

Bêşik, girtina rojnameya Welat binpêkirina mafên bingehîn yê mirovatiyê ye.

Di 30 salên borî de gelê Başûr ji bo azadî û mafên mirovatiyê bi hezaran şehîd dane. Îro li Başûr mafên mirovan tên binpêkirin û rojname ji vê yekê re bêdeng dimînin. Parastina mafên mirovan li Başûr bi şeklî dimîne. Komela Mafên Mirovan di bin destê partiyan de ye. Ev yek gihiştiyê wê radeyê ku Serokê Komeleya Mafên Mirovan yek ji berpirsyarê bijarte yê dezgeha hikûmetê ye. Rojnamevan nikarin bi hêsanî xebatên xwe yên der barê karên civakî û bûyerên terorî de bi rê ve bibin. Mînak heta niha der heqê kujyarên van kesande, ji aliyê rojnameyan ve tu vekolîn nahatiye pê: **Reûf Kamîl** Serokê Tevgera Têkoşîn, Ebû **Nesîr**, Endamê Serokatiya Partiya Komunîst, **Fransîs Toma** Endamê Parlementoyê, **Elî Bozkanî** bazîrgîaneki welatparêz û hwd.

### LI BAŞÛR KOÇBERIYA MEJÎ

Problemeke din li başûrê Kurdistanê heye, ew jî ev e ku gelek ronakbîr, rojnamevan, doktor, endazyar (muhendîz) mamosteyên unîversîte û hwd. Ji Kurdistanê derdikevin. Sedemê vê jî rewşa îro ya Başûr e: Ambargo, bêkarî, nebûna asayîş, bêbawerî bi pêşeroja rewşa siyasî, ji hevcûdakirina alîgirên partiyan ji gel, li ber çavnegirtina jêhatibûn, dilsozî û keda mirovan di warê birêvebirî û karê zanistî de. Hin kes jî hene ji ber boriyên xwe yên kevin nikarin li Başûr bimînin. Bes hejmarên evên dawî kêm in. Bêşik, valabûna Kurdistanê ji kadroyên zanyar û pispor dibe kêmasiyeke mezin ji pêşerojê re.

Ev yek tesîreke xerab dike li ser pirsa avakirina Kurdistanê û bi pêşvebirina civaka Kurd re. Di dawiyê de ez dixwazim bibêjim ku rewşa Başûr her çiqas kêmasî tê de hebin jî, divê azadiya Başûr bê parastin. Serhildana 1991'î ya gelê Kurd bû, ne ya partiyekê an jî hêzeke siyasî bû.

welat

• Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
• Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
• Navnîşan (Adres) Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul • Tel (fax) 511 50 07
• Berpirsiyariya Ewrûpa • DRAKENBERGGSG. 63, NB. 117 41 STOCHOLM/SWEDEN TLF: OO46, 88O125 FAX 0046, 8849635
• Fax: (49) 228-630715 • Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ.